

## Peywendîyên Washington - Hewlêrê stratejîk in

**Pêşmerge** bingehîn jibo kurdan, yekîtîya kurdan li Sûriyê û destnîşankirina ajandayeka hevpar e, ku bikare temsîla pozîsyoneka hevgirtî hem di astê navxweyî hem di astê navneteweyî de bike. **RÛPEL - 03**



## Şîîrê Açarnayeyî

Pey hesıyay tı deso kerreyın?
Bero asınên, paça gurota,
Balışna mı, qarula mı, rêzıla mı
Rısmo ke ser'o ez mergi ver'a ageyra wo,
Pey hesıyay tı?
"Gorışmeçi" mı pıyazo kıho erşawıto,
Bûya qerenfılı dana cexra mı
Wusar ame w Koyandê Welatê mı.

**RÛPEL - 11**



## Dilê min li Kurdistanê ye

**HUNERMENDÊ** kurd Kerem Gerdenzerî eşkere dike ku herçend ew li Rûsyayê be, dilê wî li Kurdistanê ye û ew bi çîrokên Kurdistanê mezin bûye. **RÛPEL - 14**


# bas

ROJNAMEYA HEFTEYÎ YA NÛÇE Û ANALÎZAN

HEJMAR: 05 30 ÇILE-05 SIBAT 2017

www.basnews.com




SERDEMEKA NÛ LI ROJAVA:

# HEVPEYMANÎYA KOALÎSYON Û PÊŞMERGEYÊN ROJ

### > TIRKIYE DIXWAZE BIBE ŞIRÎKÊ DEWLETÊN KOALISYONÊ

Koalîsyona navneteweyî daxwaze wê yekê ji Serokê Herêma Kurdistanê Barzanî re kirîye ku rahênana Pêşmergeyên Roj bikin. Tirkiye jî di perwerdeya Pêşmergeyan de dixwaze bibe şirîkê dewletên koalîsyonê.

### > PÊŞMERGEYÊN ROJ MIL BI MIL LI DIJÎ DAIŞÊ ŞER DIKIN

Pêşmergeyên Roj di çarçoveya peyama Serok Barzanî ya yekîtîya neteweyî û parastina xaka Kurdistanê mil bi mil li dijî DAIŞê şer dikin. Pêşmergeyên Roj heta niha di hemû sengerên şer de cî girtine û gelek qurbanî dane.

### > PYD: BILA PÊŞMERGEYÊN ROJ DI NAV YPGÊ DE CÎ BIGIRIN

PYD diyar kiribû li Rojava hêza fermî Yekîneyên Parastina Gel (YDG) e û daxwaz kiribû Pêşmergeyên Roj di nav vê hêzê de cih bigirin. Encûmena Neteweyî ya Kurdên Sûriyê (ENKS) jî ev pêşniyaz nepejiran dibû.




**EKREM ÖNEN** >02
Amerîka herêmeka aram li Sûriyê û derdora wê



**ÎSMAÎL GUVEN** >11
Ceribê Milgramî



**CIWANMERD KULEK** >13
Zimanê kur û nevîyan



**FIRAT CEWERÎ** >14
Sirgûn û edebiyata kurdî

JI BO ÇARESERIYA PIRSA KURDÎ ÇAWA YE? >05
OBJEBÛYÎNA JINAN DI RAGIHANDINÊ DE >08
KURD KENGÊ Û ÇEWAN LI BEXDADÊ HATINE BI CÎ KIRIN? >12



**EKREM ÖNEN**

## Amerîka herêmeka aram li Sûriyê û derdora wê

Di vê hefta borî de Serokkomarê DYAyê Trump di hevpeyvîneka xwe de bi ABC News re diyar kir ku “Ewropa şaşîtîyeka mezin kir ku ji Sûriyê û welatên din yê herêma Rojhilata Nêzîk ku tevlihevî lê hene bi mîlyonan mihacir vergirtine. Divê DYA di hundir 120 rojan de standina mihaciran bisekinîne. Kesên ji DYAyê re tehlîke bin lazim e zû ji welat bihêne derxistin, herweha siyaseta admînîstrasyona berê ku mihacir ji Sûriyê wergirt şaş bû ”jiber wê ez bi niyet im li Sûriye û herêmên dora wê herêmên aram ava bikim “ li gor proja ku The New York Times de belav bûye, Trump ji wezareta derve û PENTAGONê xwastîye di hundir 3 mehan de projeyekê di vê derbarê de amade bikin. Ligor The New York Times, ne diyar e ka dê li kû herêmên aram bihêne ava kirin û kî dê van herêman biparêzin. Beyanên Trump ne pir zelal in, ji vê beyana wî mirov têdigihê avakirina herêmên aram, ji geopolîtîk bêhtir geoekonomîk e û ewlekarîya hundir a DYAyê ye. Ev proje diyar e heta 3 mehan dê baş diyar bibe bê ka ev çi ye? Wek eşkere ye ev pirs berîya salekê jî kete rojevê, lê derveyî Tirkiyê kesekî piştgirî neda vê projeyê. Ne DYA ne Rûsya ne jî Yekîtîya Ewropayê. Niha ev proje dê bi çi awayî be û kî êê piştgirî bidê ne diyar e, ji alîyekê din Sûriyê niha kete qonxeka nû; rewş û helwêsta aktorên esasî Rûsya, DYA, YE, Tirkiye, Îran, Erebistana Siûdî û Qeterê hate guhertin.

Her çiqas ne bi xurtî be jî niha işaretên ber bi prosesa aramîyê ve diçe hakim e. Ev proses weha diyar e piştgirîyeka xurt dibîne. Bi taybet Yekîtîya Ewropa niha bi xurtî piştgirîye dide vê prosesê; sebeba esasî jî sekinandina hatina mihaciran û ewlekarîya Ewropa ye. Trump dixwaze bi Rûsya re di pirsa Sûriyê de li hev bike. Beşdarîya wan a civîna Astana yek ji işaretên wê bû. Pirsa herêma aram a ku Trump dibêje, dê çawa be, di nêzîk de eşkere dibe. Ka gelo herêma aram dê ji kurdan re stratejîk yan niqaşbar be, hêj ne diyar e. Jiber DYA bi îhtîmaleka xurt wê bixwaze vê planê bi tirkan re bike, heger tirk niha qebûl bikin. Jiber niha rewşa wan a Sûriyê hate guhertin helwêsta xwe guhertine û niha piştî beyana Trump a herêma aram, Tirkiyê eşkere nekirîye çiqasî bi germî li vê pirsê dinere. Heger tiştekê weha bibe, diyar e DYA eskerê wê nîne û vê ya bi îhtîmaleka xurt ku bibe dê tirk jî bêjin erê Tirkiyê dê derbasî nav axa Sûriyê û Rojavayê Kurdistanê bibin û paşê derketina wan gelek zehmet dibe. Mînaka başûrê Kurdistanê li ber çava ye, di dema destpêka bûyerên Iraqê û şerê navxweyî ordîya tirk derbasî nav axa Kurdistanê bûn û li dor 10 nuqtan bi cî bûn. Ev dor 30 sal e li başûrê Kurdistanê nikarin wan derxin. Ev dikare were serê Rojavayê Kurdistanê jî heger kurd bi dîqet tevnegerin.

Gelek ekspertên siyasî dihesibînin ku projeyak DYA weha hebe dikare şûna eskerê xwe bîne herêmê, dikarin bi pêşmergeyên Rojava ku li başûrê Kurdistanê vî karî bikin,ev ne pir dûrî aqila ye, jiber herêmên aram wê ne li herêmên rojavayê Kurdistanê bin, jiber rojavayê Kurdistanê YPG kontrol dike. Bê gûman derbasbûna pêşmergeyên Rojava xwastin û daxwaza her kurdekî ye û ev demeka dirêje gelek caran muhawele hate kirin ku derbas bibin ev muhawele bi ser ne ketin. Sebebê asasî jî ewe kû YPG razîbûna xwe bi derbasbûna wan a rojavayê Kurdistanê nade.

Herweha Hikûmeta Herêma Kurdistanê jî jibo ku pevçûn an şerek di navbera pêşmergeyên rojava û YPG dernekeve heta niha derbasbûna pêşmergeyên Rojava sekinandîye. Bê guman niha jî rîskeka wiha heye; wekî eşkere ye YPG her dem dide diyar kirin ku ew qebûl nakin ti hêzên din li Rojava hebin. Niha jî eşkere kirin ku ‘’kî dixwaze şer bike kerem kin di nava refê YPG de şer bikin.” Bê guman pirsa derbasbûna pêşmergeyên Rojava û dijderketina YPG ne bi kurdan ve girêdayî ye. Ev pirs bêhtir geopolôtîk e û bi hêzên mezin ên navneteweyî û dewletên herêmê ve girêdayî ye. Di vê prosesê de hêja ye kurd xwe ji dewletên herêmê bi dûrxin û xwe nêzî DYA, Rûsya û YE bikin. Ev ji bo hemû perçeyên Kurdistanê derbas dibe.

Bi taybet divê kurd xwe ji tiştekê grîng re amade bikin. Her çiqas wê herdem nakokî di navbera DYA û Rûsya de hebe, jiber nakokîyên wan global e, lê niha pir eşkere dibe ku di demên pêşîya me DYA û Rûsya dê liser pirsgirêkên herêma Rojhilata Nêzîk - Navîn li hev bikin. Kurd bikaribin di nava prosesê de bin û vê prosesê baş bixwînin dê gelek tiştên mezin bi dest bixin an na DYA û Rûsya her dê bixwazin ji kurdan re statuyek hebe. Wekî mînak niha Rûsya reşnivîseka yasaya bingehîn a Sûriyê li civîna Astana belav kir ku di wir de ji kurdan re desthilata herêmî heye.

Bi ya min divê kurd bi vê tenê nehên ser, hîn bêhtir, bi kêmanî federasyonê, bixwazin. Min berê jî gotibû Rûsya ji federasyona Sûriyê re amade ye. Ev reşnivîs hinekî konjukturel e jibo muxalefeta ereb a natsîonalîst di civîna ewil de aciz neke desthilata herêmî pêşneyaz kiriye. Jiber wê min di demê berê de behs lêkir ku kurd lazim bû bihevre liser navê kurdan ketibana civîna Astana. Divê hêzên siyasî yê rojavayê Kurdistanê pir zû li rêyên diyalogê bigerin, ne ku xelk ji wan re bêje; bila pêşmergeyên Rojava derbas bibin an na divê ew li hev bikin pêşmergên Rojava jî derbasî Rojava bibin û hemû bi hevre rojavayê Kurdistanê biparêzin û aktîv wekî kurd di nava prosesê de bin. Pirsgirêka Sûriyê hêdî hêdî ber bi fînalê ve diçe. Kurd prosesê baş nebînin dikarin fersendên dîrokî ji dest bidin

SERDEMEKA NÛ LÎ ROJAVA:

# Hevpeymanîya Koalîsyon û Pêşmergeyên Roj





**CESIM İLHAN**

Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî radigihîne ku heta lihevkirinek digel PYDê pêk nehêt ew dê Pêşmergeyên Roj neşînîn Rojava. Jiber ku ew dijî şerê birakujîyê ye.

**NÛNERÊN** ENKSê eşkere dikin ku hejmara Pêşmergeyên Roj aniha 7 hezar e. Pêşmergeyên nû dê bo rahênanê bihênê standin û koalisyona navneteweyî dê perwerdeya leşkerî bide wan.

Ciwanên kurd ên rojavayê Kurdistanê ku ji sibata 2012an vir de ji alîyê Hêzên Pêşmergeyên Zerevanî wekî “Hêzên Roj ên Leşkerî” ango “Pêşmergeyên Rojava” dihêne perwerdekirin, dê ji alîyê hêzên koalîsyona neteweyî ve bihêne perwerde kirin. Niha hemû pêdivîyên Pêşmergeyên Roj ên li Herêma Xazir, Başîka û Şingalê ji alîyê Herêma Kurdistanê dihêne dabîn kirin û Musteşarê Encumena Ewlehîya Herêma Kurdistanê Mesrûr Barzani jî gotibû ku ew dixwazin bi Hêzên Roj ên Leşkerî re tevkarîyê bikin. Endamê Partîya Demokrat a Kurdistan (PDK-S) Kawa Azîz jî diyar dike ku hejmara Pêşmergeyên Roj niha di navbera 6-7 hezaran de ye, ew dixwazin wekî hêzeka sêyem artêşeka ji 15 hezaran dihêtê damezrînin û bişînin Rojava. Herwiha Kawa Azizî destnîşan kiribû ku wan ji Serok Barzanî û koalîsyona navneteweyî jî destek wergirtine ku artêşeka din damezrînin.

### Koalîsyona navneteweyî dê pêşmergeyan perwerde bike

Ligor zanyarîyên ji nûnerên ENKSê hatine standin koalîsyona navneteweyî ya Amerîkayê serkêşîya wê dike pêşniyaz kirîye ku perwerde û rahênana Pêşmergeyên Roj bikin. Fuad Elîko endamê Koalîsyona Opozîsyona Surîye û Hêzên Şoreşger ên Neteweyî (SMDK) ji Heftenameya Basê re diyar kir ku koalîsyona navneteweyî pêşniyaza wê yekê li Serokê Herêma Kurdistanê Mesûd Barzanî kirine ku Pêşmergeyên Roj perwerde bikin. Herwiha Elîko amaje liser wê çendê jî kir ku Serokwezîrê Tirkiyê Binali Yıldırım di serdana dawî ya Hewlêrê de amadebûna xwe bo rahênana Pêşmergeyên Roj derbirrîye.

### Hejmara Pêşmergeyên Roj dikare bibe 50 hezar

Ligor agahîyên nûnerên ENKSê bi Basê re parvekirî gavên berbiçav dihêne avêtin û biryar hatîye standin ku hejmara Pêşmergeyên Roj jî bihête zêdekirin û hejmara wan bibe 10 hezaran. Ahmed Qasim, Rêvebirê Stenbolê ya Partîya Demokrata Kurdên Pêşverû yê Sûriyê (PDKPS) ji Heftenameya Basê re diyar kir ku dema Pêşmergeyên Roj derbasî Rojava bibin, wê hejmara wan di 5 hezar an 10 hezaran de nemîne, ev hejmar dikare bibe 50 hezar. Qasim di wê nêrînê de ye heta ku ENKS û PYD li hev nekin perwerdekirina Pêşmergeyên Roj wê bêfêde be. Rêvebirê PDPKSê îfade dike bo ku Pêşmergeyên Roj ku dê bihên perwerdekirin û techîzatkirin derbasî Rojava bibin pêwîst e TEV-DEM û PYD li hev bikin, an na dê di navbera hêzên kurdên çekdar de şerê brakujîyê derkeve.

### Îtalya pêşmergeyên jin perwerde dike

Îtalyayê yekem xula perwerdeya Pêşmergeyên Roj da dest pê kirin. Pêşmergeyên jin ên Rojava ku di şerê dijî DAIŞê de bo parastina Kurdistanê serkeftî bûn, ji alîyê Îtalyayê ve hatine perwerde kirin. Di maweya perwerdeyê de xulên teknolojîya şer û bikaranîna çekên modern bi wan hene. Di beyanata pêşmergeyên Rojava de ku ev çar sal in li dijî DAIŞê şer dikin hatîye diyar kirin ku wan derbarê bikaranîna çekên giran, dermankirina birîndaran, teknolojîya modern de agahîyên gelek bikêr wergirtine.

### Rahênana Pêşmergeyên Roj

Pêşmergeyên Roj ji 8 tabûr û 2 yekîneyên jinan pêk dihêt. Piştî perwerdeya sê mehan a dijwar, niha amade ne ku li sengerên şer di nav şertên zehmet de şer bikin. Pêşmerge digel perwerdeya bo çekên giran, di warê parastin û pevçûnê de jî dihêne perwerde kirin.

Pêşmergeyên Roj ku li Herêma Kurdistanê heta niha ji alîyê Wezareta Pêşmergeyan dihate perwerdekirin, ji niha şûn de hêzên koalisyonê bo berendamên nû digel bernameya perwerde bike- bi techîzat bike dê mesrefên wan î din jî dabîn bikin. Kar û barên tomarkirinê berdewam dike bo zêdekirina hejmara niha. Dihête pêşbînî kirin ku di nav sê çar mehan de dê dest bi perwerdeya endamên nû bikin.

### PYD xwastibû Pêşmergeyên Roj tevlî YPGê bibin

Ji alîyekê din ve çendîn caran bi Partîya Yekitîya Demokratîk (PYD) re hevdîtin hatine kirin ku Pêşmergeyên Roj derbasî Rojava bibin lê derbarê rêbaza vegera wan û birêxistina wan de encamek derneketîye. PYD diyar kiribû li Rojava hêza fermî Yekîneyên Parastina Gel (YDG) e û daxwaz kiribû Pêşmergeyên Roj di nav vê hêzê de cih bigirin. Encûmena Neteweyî ya Kurdên Sûriyê (ENKS) jî ev pêşniyaz nepejiran dibû.



**FUAD ELÎKO:**

## Ciwanên kurd dixwazin bibin pêşmerge

**PÊŞMERGEYÊN** Roj ji ciwanên kurd ên rojavayî pêk dihên. Heta niha pêşmergeyên Herêma Kurdistanê perwerde didan wê hêza pêşmergeyên rojavayî. Hêzên koalîsyonê û Herêma Kurdistanê biryar liser wê yekê standine ku hejmara Pêşmergeyên Roj bibe 10 hezar. Ev hejmar dikare bigihêje 15 hezaran jî. Encumena Neteweyî ya kurdên Sûriyê (ENKS) danezanek wek “kesên dixwazin beşdarî Pêşmergeyên Roj bibin bila navê xwe bidin me.” Belav kir. Ciwanên kurd jî diçin navên xwe didin nivîsandin û dixwazin beşdarî Pêşmergyên Roj bibin.

### Barzanî şerê brakujîyê naxwaze

Hêzên Koalîsyonê dixwazin li vir komeka leşkerên bi nîzam dirust bikin. Vê yekîneya bi nîzam ne bo Herêma Kurdistanê lê dixwazin bo Rojava çê bikin. Lê ne diyar e ka ev ciwan dê kengî derbasî Rojava bibin. Ez pêşbînî dikim piştî operasyona Mûsilê dê vegera wan têkeve rojevê. Ji alîyekê ve, PYD derbarê vegera wan de alozî derdixe. Ew ihtimal heye ku dema yekîneyên Roj vegerin bi YPG re şer bikin. Ger veger bi vî awayî be, dikare şerê birakujîyê derkeve. Em jî wê naxwazin, Serok Barzanî şerê brakujîyê naxwaze. Em daxwaz dikin PYD û ENKS li gor peymana Dihokê tevbigerin û bi vî awayî bila Pêşmergeyên Roj vegerin lê PYD vê napejirîne.

DR. MARİANNA CHAROUNTAKİ:

# Peywendîyên Washington – Hewlêrê stratejîk in


ALAN MÎLAN

**D**R. Marianna Charountaki, siyaseta kurdan li Bakur, Başûr û Rojava ji heftenameya Basê re şirove kir. Dr. Charountaki, aşkere dike ku peywendîyên Hikûmeta Herêma Kurdistanê û DYAyê mûeseseyî û stratejîk in herwiha Herêma Kurdistanê dikare bo siyaseta Rojava jî rol bigêre.

**Gelo girêdayî statusa Rojavayê Kurdistanê hûn liser encamên civîna Astanayê çi difikirin, nemaze bi vê têbînîyê ku kurd ne wekî alîyekê danûstandina, lê çend endamên ENKSê di çarçoeya oppozîsyona Sûriyê beşdar bûne?**

Beşdarîya nîvco ya kurdan di civîna Astanayê de guhertineka eşkere di siyaseta lihember Sûriyê de nîşan dide. Zêdebûna desthilata Îranê, ku bi siyasetên wê yên cîwarkirina misilimanên şîe li bajarên Sûriyê dihête diyar kirin, û siyaseta Rûsyayê ya ragirtina hevsengîya desthilatê di peywendîyên wê bi Tirkiye û Îranê re, rengdaneveya xwe bi ser muzakereyên jibo çareserîya siyasî ya piştî şerî de nîşan daye. Vê civînê herwiha selmandîye ku hêzên navneteweyî, nemaze Rûsya, di berawird bi maweyê şerî de niha boçûneka ciyawaztir liser pirsa kurdî li Sûriyê heye. Têvelîya di van siyasetana de di biryardarî û pêdagirîya Rûsyayê di parastina yekparçeyîya axa Sûriyê de dibe, berovajî armanca hêzên Rojavayî ku heta niha dixwastin bi çi bihayî dibe bila bibe rejîmê biguherin.

Însîyatîva Rûsyayê ya vexwandina civînê herwiha dikare alîyekê din yên guhertina siyaseta li vê şirove bike; çewan cî neda hemî hêzên kurdî di vê vexwandinê, nemaze gava ku mirov pêgeha xurt ya PYD û rola wê ya serekî li bakurê Sûriyê û şiyana eskerî ya wê ya berceste bide ber çavan, ku bi sehma xwe dikare hokarek be ku li derve hat hîştin. Di heman demê de, civîna Astanayê bixwe, ku armanca wê gehîştina agirbestekê bi mebesta çareserîyeka dirêjxayen e, elametê hindê ne ku zilhêz westiyane. Rûsya berî hertiştî dixwaze wekî berende ji nav vî şerî derkeve, hêzên xwe paşde bikişîne lê bi her qîmetî dibe bila bibe pêgehên xwe yê eskerî jî li wir xurt bihêle. Wisa xuya ye, ku geopolîtîka herêm dê careka din biryarê liser çarenivîsa ayindeya siyasî ya Sûriyê bide.



**Gelo tu peywendîyên aloz yên DYA/PYD lihember DYA/HHK çawan şirove dikî? Gelo DYA çawan dikare hevsengîyekê di vê peywendîyê de rabigire, gava ku em dizanin PYD û Hikûmeta Herêma Kurdistanê vê gavê di du blokên dijber li Rohilata Navîn de cî girtîne?**

Min berê jî di gotarê xwe munaqeşe kirîye, rêka yekîtîya kurdan ji PKK derbas dibe. Ji herkesî re eyan e, ku peywendîyên DYA û HHK peywendîyên muesseseyî yên stratejîk in, û ev peywendî piştî derketina şerê Dewlet Îslamî (DAIŞê) hîn xurttir bûn. Lê evana parametreyên ji hev têvel in, û siyasetên kurdan nabe liser astên cudayên hevkarîyê bihêne konsantre kirin, lê di şûna wê de divêt hêzên siyasî yên kurd peywendîyên xwe yê derve jibo ajandaya hevpara xwe bi ger bixin û mobîlîze bikin.

Ji lewre, peywendîyên ji hev cuda yên herêmî û navneteweyî yên partîyên kurdan divêt nebine kosp û asteng lihember pêkanîna yekîtî û hevkarîya kurdan. Bi wî teherî, Hikûmeta Herêma Kurdistanê, wekî dewleteka de facto ku bi awayê destûrî, herêmî û navneteweyî hatîye nasîn dikare roleka navbeynkar bigêrre, û bi heman awayî kurdên Sûriyê jî dikarin ji aliyê xwe ve jibo desthilatdarkirina kurdan li wî parçeyî tevbigerin.

Hevkarîya hundirî û navberîya kurdan ne li hemberî jîngeha herêmî ye, ku îro hevpeymanî jibo liserpêmayîna her hêzeka herêmî di sîstema pircemsera wê de heyatî û krîtîk e.

Rêbaza boçûn, bertek û helsûkefta yekîneyên navneteweyî yên dewletan peywendî bi kurdan bixwe re heye, ka ew wekî hêzeka yekgirtî tevdigerin yan wekî alî û partîyên pertûpela ku heryekî ajandayeka dijî alîyê din heye. Lewra, radeya hevgirtîbûn û yekbûna kurdan liser reftara derekî ango aktorên derekî bandoreka rasterast heye.

Heger em li şemaya jêrê binêrin, xuya dibe ku PKK, bi rexma ciyawazîyên îdeolojîk, peywendîne bi Hikûmeta Herêma Kurdistanê re damezrandine, herçende PKK bi PYD re girêdaneka xurttir heye. Û ji lewre, jiber ku di berawird bi PYD re hêzeka bi pêşînetir e, dikare bandoreka erênî bi ser Hikûmeta Herêma Kurdistanê hebe, ku ew jî bi sehma xwe peywendîyên xwe bi rêveberîya rojavayê Kurdistanê re xurttir bike. Di heman demê de, HHK dikare roleka navbeynkar a erênî liser pirsa kurd li Tirkiyê bileyîze; jiber ku peywendîne sazîbûyî di navbera Hewlêr Û Ankarayê de heye û van peywendîyan evro ji her demê bêhtir pêdivî bi ewlehîyê heye. Herwiha, HHK dikare rola benê girêdana di navbera PYD û Amerîkayê de be – ku wisa kirîye jî – ku Amerîkayê jî bi HHK re peywendîyeka stratejî heye, bi taybetî piştî destpêkirina şerê terorê yê dijî DAIŞÊ. Bi wî teherî em dikarin bibînin, dînamîka ku di hevkarîya mabeyna PYD-PKK de derdikeve holê parametreyekê diafrîne, ku bi piştevanîya HHK, rê liber yekîtîyê vedike. Tîrenîşana Hevkarîya HHK û PYD-PKK (PP) eşkere dike ku PYD nuxteya pêkvegirêdana navbea PKK û HHK ye, di heman katê de PKK jî aktorekê bi nifûz e, ku dikare HHK û Rojavyê li hev nêzîk bike.

**Serokomarê Tirkiyê welatên Rojavayê bi hewla guhertina nexşeya siyasî ya Rojhilata Navîn tawanbar dike. Meqseda wî nexşeya kudera Rojhilata Navîn e, gelo merema wî tenê bakurê Sûriyê ye? Û Çima?**

Kûdetaya 15 Tîrmehê îşareta serdemeka nû di siyaseta Tirkiyê de dide. Ev werçerxan hingî berfreh e, ku divêt em behsa serdema piştî 15 Tîrmeha 2016ê bikin – û dê bibe xaleka vegerê ku hengavên alûgorên dê bi sîstema serokatîyê wê bigihîne astê herî bilind. Serokatîya Tirkiyê niha di bin zextekê de ye, ku hevsengîyeka karîger navbera armancên berê yên dewletê - yên liser binemayê siyaseta serbixwe ku rê bide serdestî û navendîtîya Tirkiyê li herêmê, nemaze piştî bertekên Bihara Erebî – û parastina hevpeymanîya nerîtî bi dewletên Rojavayê re ragire. Armancên siyaseta DYA ku rejîmên Rojhilata Navîn biguhere û şûna wan yên zahiren demokrattir û dosttir, ku amadeyî hevkarîyê ne, bihîne ser hukmî ji herkesî re eşkere ye û ne siyaseteka nû ye. Û ev prose hîn jî berdewam e.

Siyaseta derve ya Tirkiyê qismen be jî piştgîrî da vê siyasetê, ku ev helmet di sala 2011an de gihîşt asta herî bilind. Ankara jêwerî heger ew berî hemîyan Esed ji xwe re bike hedef û zextê bîne ser ku reforman bike, dê Tirkiyeyê bike lîderê herî mezin li herêmê. Loma jî Tirkiyê hişdarî da Sûriyê ku divêt tavîlê reformên acîl pêk bihîne. (Davutoğlu bi vê armancê di 9 Tebaxa 2011 de çûbû Şamê) Lê vê desttêwerdana herêmî siyaseta derveyî ya Tirkiyê kire metirsîyên mezin de û serdestîya herêmî ya wê jî kefte bin rîska heriftinê. Lê bi rexma hindê, Tirkiye hîn jî wekî zilhêzeka herêmî pozîsyona xwe diparêze û di hevpeymanîyên xwe vegerên 180 dereceyî dike, çawan ku di rewşa Sûriyê de nişka ve xwe da alîyê Rûsyayê. Helbet, Rûsyayê dudilîya xwe liser parvekirina kontrola Sûriyê de nîşan daye, ev jî îzahek e jibo hindê ku çima nêzîkatîya Tirkiye û Rûsyayê ji ya bi Îranê re zêdetir e. Lê dawîya dawî, zilhêzên nerîtî dê siyaseta hevsengîyeka hêzê li herêmê peyrew bikin. Lê divêt mirov ji bîr neke, ku ne Rûsya ne jî DYA dê rê nedin ku zilhêzek bi tena serê xwe kontrola rûberên nifûza xwe bi temamî bixin bin kontrola xwe.



Pêşmerge bingehîn jibo kurdan, yekîtîya kurdan li Sûriyê û destnîşankirina ajandayeka hevpar e, ku bikare temsîla pozîsyoneka hevgirtî hem di astê navxweyî hem di astê navneteweyî de bike.

## EV KETWAR BÊYÎ PIŞTEVANÎYA NAVNETEWEYÎ ZEHMET E BIGIHÎJE ARMANCA

Heger kurdên Rojava şansekê wan hebe, ku bikarin bibin xwedîyê radeyeka serwerîyê li Sûriyê, bi bawerîya te kîjan rade pêkan e; otonomî, federalîsm yan hindek mafên kulturî? Bi bawerîya te kîjan rade dê ji alîyê komelgeha navneteweyî ve bihête piştevanî kirin, yan em bêjin ji alîyê zilhêzan ve?

Herkes dizane, ku di 12 novembera 2013an de Konseya Giştîya Zagonsaz ya Rêveberîya Xweser a Rojavayê bi beşdarîya 86 delege û 35 rêxistinên medenî û civakî û partîyên siyasî yên kurd, ereb, asûrî û sûryanî hat ragihandin. Di civîna duyem ya 15 novembera 2013an de damezrandina her sê kantonan hat ragihandin, ku di vê civînê de 60 endam beşdar bûn. Ev sê kantonên xweser li herêmên Cizîrê (21 janviye 2014), Efrîn (29 janviye 2014) û Kobanî (27 janviye 2014) ku di bin kontrola PYD de bûn hatin damezrandin û bi hev re bi rêya damezrandina komîteyan destûra sîstema hilbijartina rêveberîya demkî amade kirin. Lê ev ketwar bêyî piştevanî û danpêdana herêmî û navneteweyî zehmet e bigihîje armanca dawî ku otonomîyeka mînende ye.

Wekî encama dûmahîkê, berovajî Tirkiye û Îranê, di teşedana çarenivîsa piştî şerî ya Sûriyê de çendîn kayegêrên mezin û biçûk beşdar in. Lê pêşmercê bingehîn jibo kurdan, yekîtîya kurdan li Sûriyê û destnîşankirina ajandayeka hevpar e, ku bikare temsîla pozîsyoneka hevgirtî hem di astê navxweyî hem di astê navneteweyî de bike.



Hikûmeta Herêma Kurdistanê, wekî dewleteka de facto ku bi awayê destûrî, herêmî û navneteweyî hatîye nasîn dikare roleka navbeynkar bigêrre, û bi heman awayî kurdên Sûriyê jî dikarin ji aliyê xwe ve jibo desthilatdarkirina kurdan li wî parçeyî tevbigerin.

## PORTRE DR. MARIANNA CHAROUNTAKI



Dr. Marianna Charountaki wanedêrê Siyaseta Kurdî û Peywendîyên Navneteweyî li Fakulteya Dîrokê, Siyaset û Peywendîyên Navneteweyî, Ûnîversîteya Liecster, mc585@leicester.ac.uk. Warên vekolînên wê birîtî ne ji peywendîyên navneteweyî û analîza siyaseta derve û peywendîyên navneteweyî yên Rojhilata Navîn e. Dr. Marianna Charountaki nivîskara pirtûka The Kurds and US Foreign Policy: International Relations in the Middle East since 1945, (Routledge, 2010) û van gotaran e: "Turkish Foreign Policy and the Kurdistan Regional Government", PERCEPTIONS: Journal of International Affairs, Volume XVII, Number 4, (Center for Strategic Research: Winter 2012), 185-208, "US foreign policy in theory and practice: from Soviet-era containment to the era of the Arab Uprisings(s), Journal of American Foreign Policy Interests: the Journal of the National Committee on American Foreign Policy, Vol.36, Issue 4, (Routledge, 2014), pp.255-267 and 'The GCC in Kurdish politics', Journal of Arabian Studies: Arabia, the Gulf, and the Red Sea, Vol.6, Issue 2, pp.201-215, (Taylor& Francis, December 2016).



HOŞENG OSÊ

## Dewleta kûr ya Cemîl Bayik II

Hevpeyvîna Chris Kutchera bi Öcalan re ku me behsa wê di xeleka borî de kiribû, helwêst û nerîna Öcalan derbarê rewş, rol, nêzîkatî û kesartiya Bayik bi zelalî dide diyar kirin ku ji berê de Öcalan ji Bayik ne razîye. Lê pirs xwe dide pêş ev e; çima û ji ber çi? Bersiva herî nêzîk ev e ku Bayik pêştirîn kes e di serkirdatiya PKKê ku hempêş û “reqîbê” Öcalan e.

Di kongereya 2mîn ya PKKê ku di havîna 1982an de lidar ket û piştî ku Öcalan rikberiya Çetin Güngör (Semîr) dît, hayê Öcalan ji pêwistî û girîngiya ku ji dervayê saziyên partiye û di hundirê PKKê de divêt gurûpeke girêdayî xwe amade bike, çêbû. Jixwe Güngör ji damezrênerê PKKê bû û berpirsê rêxistina Ewropa yê PKKê bû û xwedî kesayetî û mejî bû, ta qûnaxa ku mirov dikare Güngör weke “Tiroteskiyê” PKKê binavbike. Di wê kongireyê de Öcalan dest bi avakirina dewleta xwe ya kûr kir û Bayik û Kalkan ji hîm û stûnên sereke yên vê “dewletê” bûn. Mirov dikare kuştin “tasfiye” kirina Semîr li Siwêdê sala 1984an weke gava yekem ya vê “dewletê” binirxîne.

Di kongreya 3mîn ya PKKê de ku sala 1986ê lidarket, Öcalan bingehên dewleta xwe ya kûr di hindirê rêxistinê de xurtir kir. Di kongreya 4mîn ku sala 1990î de lidarket, dîsa dewleta kûr a Öcalan xwe da pêş û trajîdiya Çetin Güngör di kesayetîya Mehmed Şener de dubare bû û Şener bû qurbaniyê vê “dewletê”! Hêjayî gotinê ye ku M. Şenerê di sala 1991ê li Qamişlo hate kuştin, destgirtîyê Sakine Cansız bû. Ji wê çaxê heta 2013ê Cansiz ji rêvebirina PKKê hatibû dûrxistin û marijînal kirin. Cansiz jî li Parîsê di sala 2013e de hate kuştin.

Bi kurtî be jî, mirov dikare bêje: ji sala 1982an û ta sala 2000î ve dem dema dewleta kûr a Öcalan bû. Di vê qûnaxê de gelek kadroyên pêşeng û xurt hatin kuştin û gelek kes ji “dewleta kûr” a Öcalan derketin û hinek kesên din ketin şûna wan.

Di sala 2004ê de pevçûn di navbera “dewleta kûr” a Öcalan û “dewleta kûr” a Bayik de rûda. Di vê pevçûnê de Bayik bi serket. Bi serokatiya: O. Öcalan, N. Taş, K. Yilmaz, X. Ataş… hwd ji endamên serkirdayetîya PKKê ku li ser “dewleta kûr” a Öcalan dihatin hesibandin, grûpeke mezin ji rêxistinê qut bû. Lê hinek ji “dewleta” Öcalan di PKKê de man, mînak; M. Karayilan. Weke ku min di xeleka yekê yan nivîsê de jî got; tevlî ku Karayilan serokê PKKê-KCKê bû, lê ji pişt perdeyê hemû tişt di destên Bayik de bûn. Û ji havîna 2013an û vir de piştî ku Bayik bi yek carî bû serokê rêxistinê, her ku çû “dewleta kûr” a Öcalan paş ve hat xistin û “dewleta kûr” a Bayik kete şûna wê. Di vê pêvajoyê de, mirov dikare bêje; “dewleta” Bayik bi kuştina yekemîn serokê PYDê Kemal Şahin sala 2005ê de dest bi çalakiyên tesfiyekirina rikberan kir û bi kuştina Kani Yilmaz di sebata 2006ê de dewam kir. Guman hene ku kuştina S. Cansiz jî xelekek ji xelekên çalakîyên “dewleta kûr” a Bayik be.

Tevlî ku serkêşê perçebûna herî mezin di PKKê de O. Öcalan bû, lê “dewleta kûr” a Bayik berê xwe da K. Yilmaz (Faysal Dunlayici). Tê gumankirin ku O. Öcalan bi rêya xuşka xwe Fatma Öcalan, xwe gihandiye birayê xwe A. Öcalan û xwe ji kuştin û tasfiyekirinê xelas kiriye. Ango eger ne A. Öcalan ba, dibe ku Bayik Osman Öcalan jî bikuşta. Mixabin, di dîrok û ezmûna PKKê de hemû kesên dihatin kuştin û tesfiye kirin, PKKê ew bi vanê “tasfiyekar” dida nasandin, ango, kujer navê xwe û navê karê xwe li qurbaniyê xwe dikir.

Ji salên 2001ê – 2002an û virde, di gelek daxûyaniyên ku bi rêya parêzerên xwe ve didan, Öcalan bang li dewlet Tirkiyê û hikûmeta AKPê dikir ku leztirîn dem pirsa kurdî bi şêwe û rêbazên aştîyane çareser bike berî ku PKKê ji binê kontrola wî derkeve û têkeve binê kontrola hêzên herêmî ve. Dema ku Öcalan ev hişyarî didan û projeyên çareserîya aştîyane pêşniyaz dikirin, herwisa rexneyên tund li “Qandîlê” dikir. Öcalan tim gazin ji hevalên xwe dikir ku “wî fêm nakin.” Jixwe berî ku were girtin û revandin, Öcalan tim û tim hevalên xwe yên di komîta navendî ya PKKê gelek kêmî xwe didît û bi tundî ew rexne dikirin, hetta ew didan ber dijûnan! Lê dîsan, dewlet û hikumetê bi ya Öcalan nekir. Niha jî hişyarîyên wî di cih de derketin.

Eger mirov van 16-17 salên dawî ji ezmûna A. Öcalan binirxîne dê bi hêsanî têbigihêje ku ew êdî alîgirê çareserîyê ye. Jiber ku Öcalan xwe ji tirkan re gelekî daxist û ji gelek armanc, druşm û daxwaz û pirensîpên ku PKKê liser hatibûn avakirin, daket. Lê ne Enqere ne jî Qandîl bi Öcalan re alîkar bûn. Öcalan 16-17 salên dawî de, bêtir nêzîkî Enqere û AKPê ye û her ku diçe sarbûn û nakokî di navbera Imrali û Qendîlê de bêhtir dibe. Ji derve û di şikil de Öcalan û Qendîl gelek lihev in, lê teqez, rastî ne wisa ye. Herdû alî jî li xwe mikur nayên û vê rastiyê nabêjin. Jiber ku eger bêjin, tê wateya ku PKKê êdî bûye ya Bayik û nema ya Öcalan e. Bi gotineke din: Ne Öcalan lixwe mikur tê û dibêje; “PKKê ji destên min çû”. Ne jî Qendîl û Bayik dibêjin: “Öcalanê niha ne yê berê ye. Lê Öcalanê dewlet û AKPê ye.”

# Serxwebûna Kurdistanê bo Rojhilata Navîn û cîhanê gring e



Dr. MUSA KAVAL



KURD di pir waran de beşek pir gring ji aktor, faktor û hevkêşeyên nû li Rojhilata Navîn in. Faktorê kurd peywendîdar e bi îstîqrar û asayîşa navneteweyî ve jî. Gringiya kurd û Kurdistanê, nexasim di van babetên jêrî de heye; siyasî, geostratejî, demografî, leşkerî û aborî di dahatîyê de dê hêj mestir bibît. Jiber vê yekê dewleta kurd dê bikarît bi şêwazek xurt rola xwe bo aştî, aramî, istiqrar û pêşveçûyînên demokrasî û pêkvejînê bileyîzît. Lê mixabin ev bû zêdetir ji sedsalan e ku propagandên şaş û tezên bêbin û direwîn dijî serbixwebûna Kurdan dihêne gotin û nivîsîn. Van propagandan bandoreka pirzerer liser raya giştî ya cihanî jî kiribû û hêj niho jî berdewam e. Herwiha bandoreka wisan li ser çanda siyasîya dewletên parçekerên Kurdistanê peyda kiriye ku hemû cûreyên zulm û zordarî, û qirkirinê dijî gel û bizava azadîxwaza kurd rewa hatine dîtin. Li Başûrê Kurdistanê enfal û jenosîda dijî kurdan hatin kirin,lê ne li Rojhilata Navîn, ne li demokrasiyên cihan, ne jî alema îslamî helwesteka siyasî dijî van jenosîdan nehate girtin.

Teza dijî dewletbûna kurdan dihate gotin û nivîsin û niho jî pir teref piştgiriya wê dikin. Gûya eger dewleta kurdî çêbît ,bêistiqrarî dê li Rojhilata Navîn çê bit. Kesên baweri bi vê tezê dikin û piştgiriya dikinyan rastiyê fehm nakin yanjî naxwazin fehm bikin. Eger ev ditin rast bît, hingê lazim bû ku di van sedsalên borî de istiqrarek mezin û aramî li Rojhilata Navîn hebûya.

Bila her kesek heta eger dijberên dewletbûna kurdan jî bin, destê xwe danîne ser bext û wujdana xwe û bi rastî bihizire, bila rastiyê bêjn û rastiyê qebul bikin û bersiva vê pirsê bidin: Gelo bo çi piştî damazirandina dewletên nû li herêma Rojhilata Navîn û parçekirina Kurdistanê di navbera Tirkiye, Îran, Iraq û Sûriyê de, tenanet di dewleteke jî van dewletan de istiqrar çê ne bûye. Herwisan kengê li Rojhilata Navîn jî tenahî û îstiqrar çê nebûye ? Gelo ma dewleta kurdî hebû ku bibîte sebebê vê bêistiqrariyê? Ji xwe mirov dibînin rewşa wan û ya herêma Rojhilata Navîn çewan e. Ka em bi kurtî li rewşa van welatan binêrin.

Iraq: Piştî damezrandina şahinşahîya Iraqê heta kûdetaya 1958an vê dewletê nekarî çi arîşeyên xwe çareser biket. Arîşên siyasî, aborî, civakî her gur û dijwar bûn. Piştî kûdetaya leşkerî arîşên kevn berdewam bûn û arîşên nû peyda bûn û gurtir û tundtir lê hatin. Kûdeta li pey kûdetayan hatin kirin, zulm û zordarî, û diktatorî berdewam bûn. Xelkê Iraqê di bin kabûsa rejimên diktatorî de jiyan. Cenga Îran û Iraqê, cenga Kendavê ya yekem û duyem di dawiyê de hilweşandina rejima Beesî li pey hev hatin. Jenosîd û enfal dijî gelê kurd hatin kirin.

Tirkiye:Tirkiye yeke ji wan dewletan yên ku hebûna kurdan jî nas nedikir, lê gelo Tirkiye karî îstiqrar û pêşveçûyinên siyasî, aborî û destûrî misoger biket? Ne nekarî . Piştî damezrandina Tirkiyê heta 1950an partîyeka bi tenê hukim dikir, arîşên siyasî, aborî û civakî her tuntir bûn. Piştî 1950an pirpartîtî peyda bû lê bêistiqrarî her dîsan berdewam bû. Heta 1980an her deh salan carekê inqilabeka leşkerî çêbû. Ji 1980an û hêve her deh salan carekê yan kûdetayên postmodern yan hewlên guherina rejîmê çê bûyîne. Hewla kûdetaya dawî ew bû ya di 15 tîrmeha 2016an de hatîye kirin, paşê înqilab dijî inqilabkeran hate kirin û heta niho jî berdewam e. Tirkiye jî nekariye çi pirsgirikên xwe yên siyasî, destûrî, aborî yan civakî çareser biket ne jî îstiqrarê peyda biket. Gelo ma dewleta kurdî hebû û jiber vê yekê bêistiqrarî li Tirkiye hebû û hêj niho heye?!

Îran: Li Îranê jî dewleta kurdî nîne, lê li vî welatî jî, ne îstiqrar, ne pêşkeftinên aborî, siyasî û civakî misoger bûyîne. Li Iranê çar kûdeta çêbûne: kûdetaya 1925an, kûdetaya destpêka salên 1950an bi serokatiya Mussadaq dijî şah Muhemmed Riza Pehlewî, paşê kûdetaya şah dijî Musadaq û her sala 1979 bi serokatiya Xumeynî dijî rejîma şahinşahî. Heta evro jî Îranê nekariye îstiqrara xwe misoger biket û çi pirsgirêkên xwe yên sereke çareser biket. Dewleta kurdî nîne ku bibîte sebebê arîşe û pirsgirêkên Îranê.

Sûriye. Rewşa Sûriyê ji ya Iraqê, Îranê û Tirkiye çêtir nebû. Piştî serbixwebûna Sûriyê heta sala 1970an dora deh inqilab û muhawelên înqilaban li Sûriyê hatîne kirin. Sûriyê nekarî yekê bitinê ji arîşeyên xwe yen siyasî, aborî, demokrasî û mafên mirovan çareser biket.

Her wekî me diyar kir, di van sed salên borî de, ti dewletan nekarîne pirsgirêk û arîşeyên xwe çareser bikin ne jî îstiqrarê misoger bikin. We diyar e ku di van sedsalên li pêşiya me jî bi vê eqliyetê û şêwaza hukimkirinê, ew dê nikaribin pirsgirêkên xwe çareser bikin.

Ji vê rastiyê diyar dibît: digel ku dewleta kurdî ne bû, bêîstiqrarî di van welatan de berdewam hebû û niho jî hêj xirabtir e. Berovajî van tezan eger dewleta kurdî çêbibît ew dê bite faktor û harîkareka gring bo istiqrar û pêşvebirina azadiyên giştî û careserkirina piranîya pirsên siyasî, civakî û aborî li Rojhilata Navîn. Evro herweki em dibînin, gorankarîyên mezin li Rojhilata Navîn diqewimin, beşek ji aktorên siyasîyên kevn hatin guherin û beşek din şuna wan digirin. Ideolojîyên nû peyda dibin, çemk û şêwazên hukmraniyên nû şûna yên kevn digirin. Tiştek wekî berê namînît. Di van guherînan de, pêwist e dewleta kurdî çêbibît. Bi çêbûna dewleta kurdî re, aktorekê siyasî yê nû û bêarîşe peyda dibît.

Hevsengên kevn şaş bûn, jiber vê yekê lawazîyeka mezin li herêma Rojhilata Navîn hebû û bêistiqrarî berdewam bû, arîşe li pey arîşeyan dihat. Lê dewleta kurdî dê bikarît hevsengîyeka nû û maqul biafrînît û dê bibîte aktorekê bêteref û qahîm bo istiqrarê li herêma Rojhilata Navîn.

Gelê kurd yek ji kevntirîn gelên Rojhilata Navîn e. Yek ji çar neteweyên sereke û di merkeza vê herêmê de cih digirît. Dewleta kurdî nabîte sebebê bêistiqrariyê, bi berovajî, nebûna dewleta kurdî bi şêwazekê xwezayî dê her bibîte sebêbê istiqrarê. Dewleta kurdî di heman demê de dê bibîte asteng li hember belavbûna îdeolojî û bizavên terorîstî yên tundrew yên îslamî, neteweperest û regezperest. Digel ku Herêma Kurdistanê nebûye dewlet jî, le tecribeya wê numûneyek giring û diyar e di vi warî de. Bêguman eger ev herêm serbixwe bibit dê bikarît roleka pir mestir û xurtir dijî tundrewîya îslamî û bizavên radikal t û regezperêst bileyîzît. Di encamê de, ew dê bikarît baştir metirsîya van terorîstan li Rojhilata Navîn û li cîhanên kêm biket. Di dawiyê de dikarim bêjim ku dewleta Kurdistanê dê roleka gring hebît bo istiqrara Rojhilata Navîn û cîhanê.



# DESTÛRA NÛ
# Ji bo çareseriya pirsa kurdî çawa ye?

PEYMAN DÊRÎKÎ

**PARTÎYÊN** siyasî li Tirkiyê dest bi bangeşeya rapirsîya destûrê kirine. Dihêt çaverê kirin ku di meha nîsanê de rapirsî bihêt kirin. Partîya Dad û Geşedanê(AKP) û Partîya Tevgera Nasyonalîst (MHP) liser 18 xalên destûrê li hev kirin û bi dengên parlementerên herdu partîyan pêşnuma li parlementoyê hat qebûl kirin. Dihête çaverê kirin ku Serokkomarê Tirkiyê Recep Tayip Erdoğan jî biryarê liser wê pêşnumayê bide û wê îmze bike. Piştî serokkomar ew pêşnuma îmze kir û di rojnameya fermî de ew belaw bû dê din ava 60 rojî de referandum pêk were.

Partîya Komarî ya Gel (CHP) û Partîya Demokratîka a Gelan (HDP) ku di parlamentoyê de dijî pêşnûmeya AKPê û MHPê bûn eşkere dikin ku ew dê di rapirsîyê jî de dijî wê guhertinan bin. CHP û AKP di bangeşeyên xwe de eşkere dikin ku AKPe dixwaze rejîma Tirkiye biguherînê. Lewre ew dijî wê sîstemê ne û ew dê di rapirsîyê de bêjin; "na" û dê bang li raya giştî ya Tirkiyê jî bikin ku dijî wê pêşnumayê bin.

Heta niha li Tirkiyê 7 caran referandum bo destûrê çêbûne. Di dema desthilatdarîya AKPê ev cara sêyeme ku referandum dihêt encam dan lê di ti referanduman de navê kurdan nehatîye hildan. Çavdêrên siyasî balê dikişînin ser dengê kurdan û eşkere dikin ku rola kurdan dê tesîrê liser encamên rapirsîyê bike. Nûnerên partîyên Bakur bîrên xwe derbarê guherîna destûrê de anîn ziman û eşkere kirin ku di vê destûrê jî de kurd "tune" hatine hesibandin. Nûnerên gelek partîyan eşkere dikin ku ew dê di rapirsîyê de nebêjin "ere" û dê dengê "na" bi kar bihînin.

**Cîgirê PSKê Bayram Bozyel: Em dê nebêjîn; "erê"**

Daxwaza me diyar e, êdî bi pîneyan, bi guhertinên wisa meseleyên Tirkiye, meseleya kurd û ya demokrasîyê safî nabe, bingeha pirsgirêkên heyî zîhnîyeta avakirina komara Tirkiyê ye ku rengê xwe daye destûra salên 1924-1961 û 1982 niha di pratîkê de ye. Divê ev hişmendîya ku bi ser înkara gelê kurd û kêmnetewan de hatîye avakirin bi tevahî biguhere, wekî dihête zanîn di vê destûra heyî de heta niha 18 caran guhertin çêbûne, car caran guhertinên baş jî çêbûne. Bo nimûne, di dema pêvajoya Yekîtîya Ewropa salê 2000-2010 de. Lê tevî guhertinan,felsefe û hişmendîya nîjadperest û tekparêz ya vê destûrê negûherîye. Ev pakêta dawî jî berhema AKPê û MHPê ye û mohra MHPê zêdetir liser heye ev tenê bi xwe jî nişan dide ku ev pakêt ji pirsgirêkan Tirkiyê re nabe bersiv. Em wekî Partîya Sosyalîsta Kurdistanê dibêjin ev pakêt ji derdê me re nabe derman em ji vê re nabêjin erê, em destûreka nû dixwazin da ku ji pirsa kurd û meseleyên din jî rêya çareserîyê veke û li Tirkiye sîstemeka federalî ava bibe. Tiştê heta niha me zelal kirîye yek jê ev e em ji vê destûrê re nabêjin ''erê" ya dudan em daxwaz dikin ku destûreka demokratîk û federal were rojevê ya sêyem jî raya me çi be di nava pêvajoyê da bi hevdîtinên derdorê din re bi yekdengî û perspektîvek neteweyî em ê derkevin hemberî raya giştî.



Rojeva Tirkiyê rapirsîya destûrê ye. Pisporên siyasî amaje li ser wê çendê dikin ku dê dengên kurdan tesîrê li encamên hilbijartinê bikin.

**Serokê PAKê Mustafa Özçelik: Kurd di destûra nû de jî tune ne**

Demek e bi navê rewşa awarte mafên heyî bi giştî hatine qedexe kirin û hema hema em dikarin bêjin destûra heyî jî hatîye bin pê kirin. Dema ku em li destûrên komara Tirkiyeyê ji damezrandina wê û heta îro dinêrin hemû destûr liser hişmendîya tunehesibandina milletê kurd û rêlibergirtina mafê wan ê neteweyî û demokratîk hatîye amade kirin. Di ti destûran de xeynî tirk û zimanê tirkî ti mafek ji kesî re tune, zimanê kurdî qedexeye, hebûna milletê kurd tune ye, mafê wan tune ye. Di nava kurdan de munaqeşeyên xelet hene dibêjin gelo sîstema parlementerîyê ji me re baş e an sîstema serokatîyê? Em wekî kurd dibêjin ev gengeşîya ku îro liser destûr û sîstema serokatîyê dihêt kirin di eslê xwe de ji milletê kurd re ti tiştek nîne. 25 milyon kurdên Tirkiye û Bakurê Kurdistanê mixabin yek mafê wan ne di ya heyî heye ne jî di guhertî de heye; pêwîstî bi destûreka nû heye. Ev destûra nû jî divêt hebûna milletê kurd hebûna du millet û du welat şirîkatîya Tirkiye û Kurdistanê li ser sîstemeka federal tarîf bike û maf û azadîya hemû etnîsîteyan beşên civakî,olî û mezhebên li Tirkiye û Kurdistanê jî mafê wan bixe bin garantîyê. Me wekî PAKê biryarek daye di nava endamên xwe û dor û bera xwe de em vê meseleyê munaqaşe dikin. Digel partîyên Kurdistanî jî em di pêwendîyê de ne digel wan jî helwêstek hevbeş nîşan bidin. Sê alternatîv di nava kurdan de dihêt munaqaşe kirin yek na ye, ya din boykot e, ya din jî dibêjin em ê biçin ser sindoqê protesto bikin ev alternatîv di nav me de jî dê bihêt munaqaşekirin, di nava partîya me de kesekê ku dibêje erê tune. Divêt em xwe wekî AKPê, CHPê, MHPê nebînin û xwe wekî hemwelatîyekê Tirkiye nebînin divêt wekî hemwelatîyekê kurdistanî, ji pencereya Kurdistanê li meseleyê binêrin.

**Serokê PDK-Bakur Sertaç Bucak: Kurd dihênê înkar kirin**

Ev qanûna esasî pirsa kurd û pirsa demokrasîyê li Tirkiyeyê bi giştî çareser nake û di nav çêkirina qanûna esasî de partîyeka wekî MHPe jî cîhê xwe girtîye. Şertên MHPê jî ev e ku maddeyên yek-du-sê-çar nehên guhertin. Li vê derê hebûna milletê kurd dihête înkar kirin, maneya wê jî ev e ku mafê wä yê demokratîk û yê rewa dihêt red kirin. Em û hemî kurd dîtina MHPê li Bakur baş dizanin bo vê yekê jî ew li Bakur partîyeka marjinal e. Ez bawer dikim ku jibo hewldanên referandumê kurd ewqasî neeleqadar in jiber ku pirsgirêkên wan nahên rojevê û me wekî partî biryara xwe liser referandûmê nedaye. Piştî civîna meclîsa partîyê em ê biryarên xwe diyar bikin.



Nûnerên partîyên Bakur eşkere dikin ev destûr ji pirsa kurdî re nabe derman û helwêsta wan dê ne erênî be. Çimkî mafên kurdan ên meşrû di vê destûrê de nehatine qebûl kirin.

**Berdevkê Tevgera Azadî Sedat Doğan: "Erê" jî "na" jî ne di berjewendîya kurdan de ye**

Ev destûra ku hatîye çêkirin, bi tifaqa gelên Tirkiyê nehatîye çêkirin. Ev destûr bi tifaqa 2 partîyan tenê hatîye amade kirin û ji xwe nêrîna van partîyan jî diyar e. Heger ku destûra berê çiqasî nebaş be jî mirov dikare bibêje ku sîstema nû dê ji ya berê nebaştir be. Mesela navê wê sîstema serokatîyê ye. Li dinyayê mînakên wê heye lê wekî mînak li Îngîltere modela kralîyê heye lê îro kes nikare bibêje hiqûqa kralîyê dihêt bi rê ve birin, Îngîltere wekî dergûşa demokrasîyê ye lê dewletên Rojhilata Navîn meyla wan hertim liser dîktatorîyê ye jiber wê mirov ji dahatîyê ditirse. Diktatorîya ku li Tirkiye çêbibe, mafê mirovan, mafê civakî bi giştî ji holê rake. Di naveroka destûrê de behsa kurdan nahêt kirin, li Rojhilata Navîn 50 milyon kurd hene lê ti kes behsa mafê kurdan yê bingehîn nake. Jiber wê jî "erê" û "na" dê ji kurdan re tiştek nîne. Ez ji vê destûrê ne hîvîdar im divêt kurd xwe nexin bin bandora ti kes û partîyan, bi şexsiyet û navê xwe îro kurd xwe bikin hêz.

**Serokê PDK-T Mehmet Emin Kardaş: Em dê herin ser sindoqê**

Ev referanduma ku çê dibe jibo neteweya kurdan ti zagonên ku maf û derdên kurdan çareser bike naêxe rojevê. Ev jî ligor parlemena dewleta dagirker ya Tirkiyê tiştekê xwezayî ye,di destûrê de xala herî girîng serokatî ye. Serokwezîrtî dê bihête rakirin û li şûna wî jî dê serokkomar derkeve rojevê. Jibo kurdan tiştekê ku em bibêjin baş e tune ye jiber ku daxwazên neteweya kurd gelekê cûda ne, em wekî hin kesan jî nabêjin ''em te nakin serok" û em nabêjin em naçin ser sindoqan lê jibo kurdan wekî Partîya Demokratî Kurdistana-Tirkiye em ê vê meseleyê şîrove bikin.

**Serokê Partîya Maf û Azadîyan (Hak-Par)ê Refîk Karakoç: Em guherînan gring nabînin**

Destûra heyî jixwe destûra sala 1980 ya darbeya leşkerî ye. Di naverokê de çareserkirina pirsgirêkên komara Tirkiyê ye û yê kurdan tune. Jibo çi ev dihêne guhertin? Jibo ku sazîyên dewletê zêde bixebitin û zûtir biryaran bistînin siyaseta xwe ya îroyîn ya xelet bajon, jibo vê yekê ev guhertin çê dibe. Ev guhertin jibo kurdan tiştekê nû nîne bo gelê me jî ti xal di nava wê de tune, em li hemberî van tiştan in û vê yekê rast nabînin. Emê di meha sibatê de bi meclîsa partîyê re civînekê lidar bixin û li hember referandûmê em dê helwêsta xwe bi wî awayî diyar bikin. Di vê destûrê de kurd tune ne û pirsgirêkên wan jî li ber çav negirtine, di maddeyên ji meclîsa Tirkiyê derbas bûne de jixwe bo kurdan tiştek tune, û em jî wê guherînê gring nabînîn.

**Serokê ÖSP Sinan Çiftyurek: Em dibêjin "na"**

Partiya Azadî û Sosyalîzmê dibêje ku di vê referandumê de divê em bêjin 'na'. Nabûna me jî ji partiyên wekî CHPê û Partîya Nîştimanî ya Doğu Perînçek cûdatir e. Em tenê ji 18 xalên destûrê nabêjin 'na' divê em ji destûra bingehîn ya 1982a jî re bibêjin 'na'. Destûra 1982an generalan çê kiribûn, çi pirsgirêka kurd çi pirsgirêka gelê Tirkiyeyê qet çareser nake pirsgirêk di vir de derdikeve holê. Em wekî ÖSPê bangî partiyên kurdan dikin û li Amedê partîya me yek bi yek digere û danûstendinên me hene. Em dibêjin lihember guhertina 18 xalan û destûra bingehîn ya 1982an di referandumê de em wekî partîyên kurdan helwêsta xwe diyar bikin û bibêjin 'na'. Em dibêjin na lê em çi dixwazin divê em daxwazên xwe jî bêjin.



Bayram Bozyel



Mehmet Emin Kardaş



Mustafa Özçelik



Refîk Karakoç



Sedat Doğan



Sertaç Bucak

# QEYRANA SÛRÎYÊ:
# Destûra rûsan dê bibe çareserî?



DERYA KILIÇ




Li Astanayê bi serperiştîya Rûsya, Îran û Tirkiyê, di 23-24 Çileya 2017an de jibo sibêroja Sûriyê hevdîtin hatin pêk anîn. Rûsya di dawîya civînê de jibo Sûriyê destûrek pêşkeşî opozîsyonê kir. Ligor zanyarîyan rojavayê Kurdistanê jî dê bibe herêmeka otonom û dê rê liber perwerdeya zimanê kurdî vebe.

**ASTANA**, paytexta Qazaqistanê di 23-24 Çileya 2017an de mazûvanîya bi sedan diplomat, wezîr û nûnerên dewletan kir. Bi garantorîya Rûsya, Îran û Tirkiyê jibo sibêroja Sûriyê hevdîtin hatin pêk anîn. Di civînê de biryara berdewamkirina agirbestê hat standin û wekî ku Wezîrê Derve yê Rûsyayê ragihandîyê pêşnumayek pêşkeşî muxalifan hatîye kirin. Lê opozîsyon lidij vê biryarê derket.

Ligor zanyarîyên ku ji alîyê Sputnik Newsê ve hatine parve kirin; destûr li Astanayê û ji alîyê pisporên rûs ve hatîye amade kirin. Wezîrê Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov derbarê vê de diyar kir ku ev destûra di çarçoveya nêrînên rejîm, muxalifan û aktorên herêmê de hatîye nivîsin.

Herwiha endamên PYD û berpirsên îdareya Rojavayê Kurdistanê ji heftenameya Basê re diyar kirin ku nêrînên wan bi tevahî nebe jî di destûrê de cih girtîye. Ji alîyê din ve ji meha kanûnê vir de PYD, Rûsya û rejîm dicivin. Wisa xuya ye ku naveroka civînan diyar dibe.

Muxalifan dijî vê destûra bingehîn acizî û nerazîbûnên xwe nîşan dan û derbarê naveroka wê de zanyarî nedan. Ligor zanyarîyên ku ji alîyê medyayê ve hatine ragihandin jibo Rojavayê xweserî hatîye destnîşan kirin û kurdî jî dibe zimanekê fermî. Rûsya derbarê naveroka destûrê de zanyarîyan nade. Li alîyê din herdu welatên garantor Tirkiyê û Îran jî heta niha liser vê mijarê ti daxuyanî nedanin.

Herwiha dihête çaverê kirin ku di 8ê Sibatê de li Cenevê bo siberoja Sûriyê dîsa hevdîtin dest pê bikin. Ligor bîr û rayên pisporên siyasî PYD dê bo hevdîtinên Astanê bê vexwandin.

**Xweserîya Demokratîk û PYD beşdarî civîna Moskoyê dibin**

Lavrov di daxuyanîya xwe ya çapemenîyê de ragihand ku dê roja înê yê li Moskovayê bi muxalîfan re civînekê pêk bîne û derbarê hevdîtinên Astanayê de zanyarîyan bi wan re parve bike. Lê vê carê nûnerên siyasî yên muxalefetê hatine vexwandin. Ji muxalifan kî dê beşdar bibe ne diyar e. Lê ligor zanyarîyên Basê bi dest xistine endamên Xweserîya Demokratîk û PYDê jibo civînê bi awayekê fermî hatine vexwandin û dê beşdarî civînê bibin. Di civînê de jibilî Astanayê dê destûr jî bi awayekê hurgilî bihête nîqaş kirin û jibo hevdîtinên Cenevê jî amadekarî bihêne kirin.

**Sûriyê dê bibe dewletaka sekûler û demokratîk**

Li gor daxuyanîya ku Nûnêrê Daîmî yê Sûriyê li Neteweyên Yekbûyî Beşar El Ceiferi di dawîya civînê de dabû çapemenîyê, liser pênasekirina navê Sûriyê nîqaş derketîye. Jiber ku li Sûriyê gelek etnîsîte, dîn û mezheb hene, rejîm dixwaze Sûriyê bi awayekê sekûler û demokratîk bihêt bi rê ve birin û peyva sekûler bê bi kar anîn. Lê nûnerên muxalîfan û Tirkiyê ev qebûl nekirine.

Ji alîyê din ve ligor zanyarîyên ku ji çavkanîyên xwecî hatine bi dest xistin di destûrê de liser navê Komara Erebî ya Sûriyê jî xalek heye û ligor vê xalê navê Sûriyê diguhere û peyva 'erebî' dê jê bihête rakirin û 'Komara Erebî ya Sûriyê' dibe 'Komara Sûriyê'.

**Di destûrê de federalîzm tune**

Bi vê destûrê careka din jî diyar bû ku rejîma dewlata Sûriyê sîstema federalîzmê naxwaze. Nûnêrê Sûriyê li Neteweyên Daîmî yê Sûriyê li Neteweyên Yekbûyî, Beşar El Ceiferî li Astanayê diyar kir ku kurdan di dîroka welatê wan de roleka mezin lîstîye. Ceiferî jibilî vê liser sekûlerîyê rawestîya. Lê derbarê federalîzmê de ti peyv negot. Berê Ceiferî, endamê partîya Beesê Xelef El Muftah jî di daxuyanîyeka xwe de liser kurdan axivî û eşkere kir ku li ser erdnîgarîya Sûriyê erdnîgarîya kurd û kêşeya kurd tune. Kurdên Sûriyê ji Tirkiyê û Iraqê hatine." Herwiha opozîsyon jî di heman mîjarê de wekî rejîmê difikire. Lê Xweserîya Demokratîk û partîyên siyasî yên Rojavayê lidijî van gotinan nerazîbûnên xwe nîşan didin û eşkere dikin ku ew dê dev ji federalîzmê bernedin.

Hevseroka Desteya Rêxistinî ya Federasyonê Roza Yusif, Rawêjkarê Hevserokê PYDê Sîyanok Dibo û Endamê Polîtbîroya Partîya Yekîtîyê Selah Alemdarî federalîzm û destûra bingehîn a rûsan ji Rojanameya Basê re nirxandin.



## RAWÊJKARÊ HEVSEROKÊ PYDÊ SÎYANEK DIBO:
## DESTÛR DI ENCAMA HEVDÎTINÊN ASTANAYÊ DE NEHATÎYE AMADE KIRIN



RAWÊJKARÊ Hevserokê PYDê Sîyanek Dibo di despêka axaftina xwe de civîna Astanayê rexne kir û bi vê amaje kir ku civîna Astanayê girîng e. Lê ti jê encam derneketîye. Alozîya Sûriyê bêtir kûrtir kirîye. Destûra ku ji muxalîfan re hatîye pêşkeş kirin, di encama hevdîtinên Astanayê de nehatîye amade kirin. Ev di meha Nîsana 2016an de hatibû belav kirin. Xweserîya Demokratîk û PYD peymana civakî bû 3 sal e amade kirîye. Divê bi biryara xelkên Sûriyê peymana civakî bê amede kirin û referandûm bê pêk anîn.

**Em dê beşdarî civîna Moskovê bibin**

Dibo di berdewemîya axaftina xwe de destûr nirxand û got: "Em bi rengekê erênî li destûra Rûsyayê dinêrîn. Xalên destûra rûsan zaf ji peymana civakîya ku me îlan kirîye, dûr nîn in. Jiber vê em dikarin liser vê goftegû bikin."

Herwiha Sîyanek Dibo dervarê civîna Moskowê de zanyarî parve kir û wisa pê de çû: "Jibo civîna ku di 27 ê Çîleyê de li Moskowê dê bihêt li dar xistin, bi awayekê fermî em hatine vexwandin. Ev civîneka girîng e. Em dê beşdarî civîna Moskoyê bibin. Herwiha vê civîna bi Hevdîtinên Ceneveyê ku di 8 Sibatê de dê bê li dar xistin, giredayîye. Nûnerê Xweserîya Demokratîk yê li Fransayê Qadir Îsa û Nûnerê PYDê yê li Moskowê Abdulsalam Alî dê beşdarî civînê bibin."

## ENDAMÊ POLÎTBIROYA PARTÎYA YEKÎTÎYÊ SALAH ALAMDARÎ:
## REJÎM Û OPOZÎSYON DÊ TI CAR FEDERALÎZMÊ QEBÛL NEKIN

ENDAMÊ Polîtbiroya Partîya Yekîtîyê Salah Alemdarî nêrînên rejîmê yê derbarê federazlîzmê de ji Basê re nirxand û rave kir ku rejîma Sûriyê wekî navendî bû 50 sal e dest bi deshilatdarîye kirîye û wê ti car qebûl nekir û nake ku di hindirê Sûriyê de rejîmeka federalî çê bibe. Jiber vê di sibêrojê de barê kurdan giran e.

Ji alîyê din vê Alemdarî lidijî vê destnişanîya berxwedana kurdan kir û eşkere kir ku divê kurd berxwedana xwe bidomînin û divê projeya xwe bajon serî. Li hemû cîhanê sîstema federalîzm cuda cuda ne. Me rengekê tenê nîşan nedaye. Bo mînak li Rûsyayê jî federalîzm heye; li Swîsse jî. Lê hemû wekî hev nînin û xwedîyê rengê xwe ne. Li Sûriyê jî divê di federalîzmê de taybetîya herêmê hebe.

Alemdarî di dawîya axaftina xwe de wisa got: "Rejîm û opozîsyon ticar federalîzmê qebûl nakin. Lê hewce ye kurd bi her awayî vê projeyê pêk bîne. Jibo vê divê hevdîtin û danûstandin bihên kirin ku hemû Sûriyê kurdan û armanca wan nas bike."



## HEVSEROKA DESTEYA RÊXISTINÎ YA FEDERASYONÊ ROZA YUSIF:
## LISER DESTÛRA SÛRIYÊ NÎQAŞ DIHÊNE KIRIN

HEVSEROKA Desteya Rêxistinî ya Federasyonê Roza Yusif derbarê destûra rûsan de axivî û da zanîn ku vê pêşnîyaza rûsan niha dest pê nekirîye. Rûsan demek berê dest bi xebatekê kiribûn. Rûsan ne wekî destûr; lêbelê wekî pêşnîyaz ji me re nêrînên xwe digotin. Divê em pêngaveka wisa bi rengekê erênî binirxînin. Jiber ku liser Destûra Bingehîna Sûriyê nîqaş dihêne kirin. Me hertim digot destûreka nû jibo Sûriyê pêwîst e. Divê hemû xalên wê ji nû ve bê nivîsîn. Liser vê nêrîn û pêşnîyazên me jî hebûn.


Yusif di berdewamîya axaftina xwe bal kişand ser pêwîstîya destûreka nû û wisa got: "Heger xalên destûra bingehîn, berê 2011an bihatana destnîşan kirin, rewşa Sûriyê dê baştir bûbûya. Bi rastî di nava 6 salan de li Sûriyê di sîstemê de gelekî grhertin û veguhertin çê bûn. Lê ti arîşe çareser nebûn. Me berê jî nêrînên xwe bi rûsan re parve kirin. Me got: 'Bi pînekirina sîstema dewleta navendî ti tişt rast nabe. Divê guhertinên bingehîn bihêne kirin.' Lê di vê destûra bingehîna de ku ji alîyê rûsan ev hatîye amede kirin jî bes nîne û hemû arîşeyan çareser nake. "

Roza Yusif amaje kir ku hin nêrînên wan di vê destûra bingehînê de hene. Lê hemû nînin. Bo mînak wan gelek caran guhertina komarê xist rojevê û wan rave kirîye ku Cumhûrîya Erebî ya Sûrî nabe. Jiber ku navê erebî hemû pêkhateyan nagire nav xwe, hewce ye ev peyva jê bihête rakirin. Di wan demên derbasbûyî de pêşnîyazeka wan ya bi vê rengî hebû. Ew vê wekî guhertineka erênî dinirxinin. Di ware ziman de jî hinek guhertin hene. Wan digot pêwîst e zimanê kurdî bibe fermî. Lê ne tenê kurdî. Wan jibo hemû zimanan gotibû. Jiber ku hemû miletan nagire nav xwe. Ew sîstema federatîv jibo Sûriyê baş dibînin.

Yusif bal kişand ser şerîetê û diyar kir ku meseleya din jî şerîeta îslamî ye. Ligor nêrîna wan divê hemû bawerî li tevahîya Sûriyê serbest bin û hemû bawerî xwe rêk bixin û rê liber azadî û bawerîya xelkê Sûriyê nehête girtin.

## ENDAMÊ DEFTERA SİYASÎ YA PDKÎ MİHEMED NEZÎF QADİRÎ:

# Dê Rasan berdewam bike





Rasan girêdana xebata çiya û bajêr e. Baskê pêşmerge dê digel nivşên nû û çalakvanên siyasî bi heman vatişê di ber bi xebateka cemawerî ya giştgîr meşekê bidine dest pê kirin.

■ SASAN TOFÎQ

**MIHEMED** Nezîf Qadirî, endamê deftera siyasî ya Partîya Demokrata Kurdistana Îranê (PDKÎ) derbarê helmeta rasanê ya îsal li Rojhilatê Kurdistaê bi destê PDKÎyê de dest pê kir ji heftenameya Basê re axivî. Qadirî aşkere dike ku xebata PDKÎyê xwe dispêre paşxaneka dîrokî û wiha berdewam dike:"Xebat û têkoşîna partîya me ji mêj ve dest pê kirîye. Xebata me û hizra me ya siyasî digihîje sala 1941ê û bi damezrandina Komeleya J.K hate dest pê dike. Piştî wê wekî berdewama Komeleya Jiyandinewey Kurd, Partîya Demokrata Kurdistanê dihête damezrandin. Di maweyê xebata siyasîya xwe de, Partîya Demokrat wekî pêşeng û pêşrewê neteweyê kurd bo cara yekê wîst û xwastên gelê kurd di çarçoveya bernameyeka siyasî de formule kir. Piştî demeka kurd karî yekem destkefta siyasî û neteweyî bo gelê kurd tomar bike, ku ew jî ragihandina Dewleta Cumhûrîya Kurdistanê bû, ku di ferhenga siyasî ya me de em wekî Komara Kurdistanê pênase dikin. Lê mixabin piştî ku hevsengên hêzan tûşî alûgoran hat, Komara Kurdistanê kefte ber hêrişên dewleta merkezî ya dîktator a padişahîya Mihemed Riza Şah. Hêrişa ku hate ser her du komarên Kurdistan û Azerbaycanê bû sebeba paşekişeya tevgera azadîxwaz a gelên Îranê. Lê partîya me dev ji xebat û berxwedanê nekêşaye."

Di beşeka din a axaftina xwe de Qadirî behsa xebatên PDKÎyê jî dike û wiha dibêje: "Di sala 1953an de bo nimûne partîya me karî hindek xebatên civaka medenî, ji wan rêxistina cotyarên navçeya Mukriyanê bû, pêk bihîne. Ev xebat hem dijî sîstema padişahîyê hem jî dijî sîstema civakî ya wê demê ya Kurdistanê bû. Paşê di dawîya salên 60an de, karî rêberîya xebateka çekdarî bike, ku zerereka gelek gehande dewletê. PDKÎ bi wan helmetan karî dengê azadîxwazîya gelê kurd bigihîne gelên din ên Îranê. Herçende dewleta Îranê wê demê pir hêz bû û wisa xwe nîşan dida ku li Rojhilata Navîn giraveka tenahîyê ye, lê PDKÎ yê îsbat kir, ku rêxistineka siyasî ya armancdar e û dikare ji rejîmê re meydanê bixwîne. Paşê şorişa Îranê çê bû, ku gelek hêvî jibo gelên Îranê çê kirin, lê mixabin dîktatorîya padişahî bi dîktatorîya meleyan hate guhertin. Û gelên Îranê, nexasim partîya me mecbûrî xweparastinê kir."

Baskê çekdarî yê partîya me ku pêşmerge ne xebata çekdarî kirîye. Niha jî em di pozîsyona xweparastina çekdarî de ne.  PDKÎyê hertim xwe nû kirîye.

Di maweyê çend mehên destpêka şorişa Îranê de, me xebata medenî dikir. Lê em di bin metirsîya Komara Îslamî de bûn, lewa me dest bi xebata çekdarî kir, ku bo maweyê 37 salan dewam kirîye. Baskê çekdarî yê partîya me ku pêşmerge ne xebata çekdarî kirîye. Niha jî em di pozîsyona xweparastina çekdarî de ne.  PDKÎyê hertim xwe nû kirîye. Heta karîye ji hêzên ciwan kelk wergirtîye. Heger mirov bi rêxistinên din yên kurd re berawird bike, terkîba rêberayetî û rêveberîya partîya me herî zêde genc in. Di nav organên me de genc yên biryarder in. Li Ewropa jî herwiha berpirsên hizbî yên me genc in. Mamosteyên zankoyan rawêjkarên me ne. Em ji hemî şiyanan istifade dikin. "

Li aliyê din siyasetmedar Qadirî amaje bi tefsîra Rasanê jî dike û tekez dike ku xebata wan ri carî beramber Komara Îslamî ya Îranê ranewestiya ye. Lê jibo parastina destkeftên Başûrê Kurdistanê wan xebata xwe hinekî rawestandibû. Qadirî wê prosesê jî wiha rave dike: "Ew tefsîra we bixwe ji Rasanê ye, jiber ku partîya me ticarî berxwedana xwe dijî rejîma Îranê ranewestandîye. Lê piştî Raperîna sala 1991ê li Başûrê Kurdistanê, pêdivîya wê bi wê yekê hebû ku destkeftên xwe nehadîne bike. Jiber vê hindê jî nedibû ti behane bikeve destê welatên cîran û ew hereşe li wan destkeftên başûr nekin, loma me xebata xwe hindekî rawestand, ku ev behane nekeve destê welatên cîran ên herêmê. Bizav û tevgera me her hebûye. Lê helmeta Rasanê girêdayî hindek helûmercan e, ku birîtî ye ji rêkeftina Îranê bi welatê 5+1 re çêkirî. Piştî vê rêkeftinê destê rejîmê avale bû û dest pê kir pêgehên xwe xurt bike, ku gûya opozîsyona Îranê nemaye. Ku di nav Îranê de jî xebateka wisa nemaye. Me di komîteya merkezî de tehlîlek liser rewşa tevgera kurd bi giştî û helûmercên Rojhilatê bi taybet kir, û paşê me biryar da ku hêzên me yên pêşmerge di kûrahîya Rojhilatê Kurdistanê de dest bi xebata eskerî bike."


Endamê deftera siyasî ya PDKÎyê Mihemed Nezîf Qadirî behsa beşdarîya gencên kurd bo nav PDKÎyê peywendiyên PDKÎ û partîyên dine Kurdistanê jî kir û wiha got: "Bi dirêjahîya dîroka hizbê, hevnîştimanîyên kurd ji beşên din yên Kurdistanê hertim hatine nav refên partîya me. Niha jî wisa ye; siyaseta me ew e, ku herkesê prensîpên hizba me qebûl bike, pêxemet xebata neteweyî de dikare bihête nav refên me, evca bakurî be, başûrî be yan rojavayî. Peywendîyên me bi wan re brayane, dostane û netewayetî ye."

Di dawîya axaftina xwe de Qadirî amaje bi siyaseta PKKê li bakurê Kurdistanê jî kir û destnîşan kir ku li bakur derfeta xebata medenî heye di şerê dawîn yê PKKê û dewletê de xelkê medenî yê kurd zerermend bûne. Qadirî axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bi bawerîya me divêt PKK siyaseta xwe cardin di ber çavan re derbas bike. PKK divêt bikare hevsengên Rojhilata Navîn bixwîne, ku vêgavê liser blokên berjewendîyan de belav bûye; Rûsya, Îran û Tirkiye niha di ittifaqeka zimnî ne. Dewlet û milîşyayên şîe jî di nav wê blokê de ne. Loma divêt ligor alûgorên ku li navçeyê çê dibin, PKK siyasea xwe di ber çavan re derbas bike. Li bakur derfeta xebata medenî heye, dikarîbûn wan firsetên siyasî û civakî ku li wir hene bi kar bihînin. Şerên ku li bakur çê bû, xelkê kurd û nemaze xelkên ku sempatîyan wan jibo PKK hebû, herî zêde ji wî şerî zerermend bûn.



### PDKÎ JI YEKRÊZÎYÊ RE AMADE YE

Nezîf Qadirî amajê bi yekrêzîya PDKa Rojhilat jî dike û tekez dike ku ew amadene pêşweziyê li HDKê bikin lewre kadirên HDKê hevrêyên wan ê berê ne û derîyê hizbê li wan vekiriye. Qadirî liser pirsa me ya yekrêzîya HDK – PDKê jî wiha got: "Siyaseteka wan ya giştî heye, bi guhertina sekreter ew siyaseta nahête guhertin. Zêdebarî vê çendê, gotara wan ya siyasî çi dibe bila bibe, em bixwe li bendî hengavên praktîk in. Liser peywendî û hevgirtina me ez vê bêjim, ku jixwe me ticarî nexwastîye ew ji me cuda bin. Kongreya me ya sêzdehê çê bû, wan jî dengê xwe da hemî madeyên kongreyê, lê paşê rabûn partîya me parçe kirin, ev parçebûn bê dilê me çê bûye, bêguman em dixwazin yek hizb bin. Ew hevalên me bûn, ciwanîya xwe, umrê xwe di vê hizbê de di xizmeta kurdayetîyê terxan kirine, ji lewre em hêvîdar în siyaseta xwe cardin ber çavan re derbas kin û bihên nav hizba xwe û emê jî pêşwazîya wan bikin. Siyaseta me  ya dîyalogê e û niha jî hevdîtinên me berdewam in. Ji ruwangeha me ve ti kospek lihember diyalog û hevdîtinan tine."



### RASAN XEBATA BAJAR Û ÇIYAN E

SİYASETMEDAR Qadirî aşkere dike ku dê Rasan berdewam û  Rasan xebata bajar û çiyan ne û dê pêşmerge di nava xelkê de cihê xwe bigrin. Qadirî xebatên Rasanê jî wiha rave dike: "Peyama Rasanê peyama xebat û berxwedanê ye. Peyama rewşengerî jibo girseyên gel e. Rasan girêdana xebata çiya û bajêr e. Baskê pêşmerge dê digel nivşên nû û çalakvanên siyasî bi heman vatişê di ber bi xebateka cemawerî ya giştgîr meşekê bidine dest pê kirin. Peyama wê ev e, ku Rojhilatê Kurdistanê bibe kelaya berxwedan û xebatê. Û di vê arasteyê de ev helmet dê rahînaneka baş bo tevgera kurd di nav komelgeha Rojhilatê biafrîne. "

Nûnerê PDKÎyê Qadirî behsa helwesta HDKê ya derbarê Rasanê jî dike û wiha berdewam dike: "Hevalên ku ji me cuda bûne (yên HDK), bi taybet sekreterê wan yê giştî yê hingê hindek dîtinên xwe di hevpeyvînan de diyar kirin û bawerîya wan ew bû ku gûya wextê Rasanê nîne û dê zayiata wê zêde be. Boçûnên wan digel ketwarê civaka me hev nagire, zerûreta van hengavan nabînin. Bo nimûne di şûna helmetên wekî yên me, teşebbusê bi muzakerê bi dewletê re dikin. Wan çend caran berpirsên Ittilaatê dîtin û ti destkefteka wan hevdîtinan nebû jî. Bi ser de rastî rexneyên gel û tenanet kadir û hevalên xwe hatin."

# Objektîfîyekirina jinan di raagihandinên bazirganî de

PIRJEEN SALIH

**ARMANCA** vê esseyê twêjîneka kurt e, liser dîroka ragihandinên bazirganî û bikaranîna jinan di van ragihandinan de, ku armanca serekî ya wê rakişandina bal û meyla mezaxgeran jibo kirrînê ye.

Ragihandinên ticarî, yan bi navê xwe yê modern, reklam cara yekem di sedsalên 18an û 19an li Ewropayê, nemaze li Brîtanyayê zahir bûn. Beşa yekem a vê esseyê lêvegerrek e liser paşxana dîrokî ya kartên bazirganî (trade card) wekî amrazeka enformasyona bazirganî û beşên din dê ji perspektîvên cuda liser wênakirina jinê di van kartan de be. Jin bi giştî bi sê awayan di van kartên bazirganî de dihêne sêwirandin; jinên bazirgan, jinên mezaxger û jin wekî beşek ji kalayê bixwe. Herwiha prosesa dîrokî ku bû egerê rolên guherende yên jinan di mewdayê sedsalan ango sedsalên 18an û 19an de dê bikevîte ber tîrêjên vê twêjînê.

**Encam**

Şorişa endustriyel tevî kolonîzekirina navçeyên berfreh li Asya û Hindê, dewlemendîyeka bêpêşîne jibo Ingilterê dabîn kir û herwiha çînên nû yên civakî afrand; çîna karker ya kêmmûçe û çîneka navîn ya ber bi berfrehîyê de. Kultura mezxgerî digel wan hate guhertin, digel wê jî pozîsyona jinê jî hate guhertin. Prosesa bikaranîna jinê di nasandin û bazarpeydakirina kalayan de di kartên bazirganîyê de dihête dîtin. Jin êdî ne tenê hilberên kelûpelên malê, drûtin û perwerdekirina zarokan, lê derfetên madî ew hel jibo wan rexsand ku bikarin kalayên nû jibo xwe dabîn bikin daku bi vî teherî meremên wekî “mode, zewq û stîl heta bigire dewlemendî û status, dîrok û neseb, ji girêdnên siyasî û dînî bigire heta şexsiyet, peywendî, bîr û mirinê” (Vickery, A., 2006:14) derbibirrin. Serdema nû derfetên pîşeyên nû li derveyî malê jibo jinê rexsand, lê di heman katê de vê serdemê ew, yan seksualîteya wê, kire temamkera kalayên ticarî.




Kultura mezxgerîyê digel şorişa pîşesazî û kolonîzekirinê de hate afrandin û digel wê pozîsyona jinan di civakê de hate hilguhertin. Kartên bazirganîyê seretaya prosesa bikaranîna jinê di nasandin û bazarpeydakirina kalayan de eşkere dike.

**Çavkanî**

Barker, Hannah (2005) ‘Women and work’, in Women's History: Britain, 1700–1850, Hannah Barker and Elaine Chalus (eds), New York,.

Berry, Helen (2005) ‘Women, consumption and taste’, di Women's History: Britain, 1700–1850 de, Hannah Barker and Elaine Chalus (eds), New York, NY: Routledge.

Corrigan, Peter (1997) The Sociology of Consumption, an Introduction, London: SAGE Publications.

Evans, Tanya (2005) ‘Women, marriage and the family’, di Women's History: Britain, 1700–1850 de, Hannah Barker and Elaine Chalus (eds), New York, NY: Routledge.

John Johnson Collection Exhibition 2001 (http://www.bodley.ox.ac.uk/johnson/exhibition/), accessed 5 Jan 2014 17:43 GMT)

Lysack, Krista (2008) Come buy, Come buy, Shopping and the Culture of Consumption in Victorian Women's Writing, , Athens, Ohio: Ohio University Press.

Solomon-Godeau, Abigail (1996) ‘The Other Side of Venus the Visual Economy of Feminine Display’, di The Sex of Things, Gender and Consumption in Historical Perspective de, Victoria de Grazia and Ellen Furlough (eds), Berkeley: University of California Press.

Vickery, Amanda (2006) ‘His and Hers: Gender, Consumption and Household Accounting in Eighteenth-Century England’, di Past & Present, 2006 Supplement de (Vol 1), Oxford: Oxford University Press.



## JINÊN MEZAXGER

**Bi** kêmbûna pîşesazîya malê û peydabûna dirûvekê nû ya kirînê li Ingilterê, çîneka nû jî di civakê de teşe girt; çîna mezaxgeran. Jiber ku gelek çalakîyên berhemdêrîyê li malê dikefte stûyê jinan, wekî encam ew dibûne beşa serekî ya mexagerên kalayên ku berê li malê dihatine hilberandin. Epoka kolonyal ya nîva sedsala 19an jibo Ingilterê çendîn cûre kalayên erzan ji gelek deverên cîhanê dabîn dikir. Hawirdekirina kalayên wekî kitan, hevrîşim, çinî û kelûpelên din yên lûks bi rêka Kompanyayên West India [Rojavayê Hindûstanê] bo bazarên Ingilterê rewştekê din yê kiryarîyê afrand; rewşta shoppingê. Damezrandina kargeh û fabrîkeyên ku kalayên hemşêwe hildiberandin, hîn teşeyekê bercestetir da mezaxgerîya shoppingê. Mezaxgerê navincî yên wan kalayan jin bûn.

Hewesa jinan jibo tekstîlan hem di edebîyat hem jî di kartên bazirganî de hatîye wêna kirin. Messrs. Harding Howell & Co (Fîg 5) heçku dîmenekê vegêrrayî yê pirtûka Jane Austinê ya bi navê Emma be, ku vedigêre “dikanên Highbury ji Harriet Smithê re wekî biheştê ne, stara xwe dibete dikana Ford, dikana herî mezin a bajêr, ku froşyarîya berhemên rîs, kitan û trîkoyê hemî di cîyekî kom kirîye.“ (Vickery, A., 2006:29) Wekî akam, ji salên 1860n ve “shopping wekî formeka berceste ya mijûlahîya jinên çîna navîn kefte gorepana jiyanê.” (Lysack, K., 2008:2) Faktoreka din ku geşe da kultura shoppingê destpêkirina departmentên navendên kirrîn û frotinê, yan bi gotina îro mall bû. Malla yekem ya brîtanî di sala 1863an de vebû. Berê kalayên frotinê lipişt kontuaran bû, lê niha tam hatibûn liber destê mezxageran. Malla Smith, Son & Wethered, Drapers, Hosiers & Haberdashers, Importers of Foreign Silks, Shawls & Velvets, Linen & Carpet Manufacturers & c. [Kincfroş, Froşyarên Gore & Eştûmekên drûmanê, Hinardekarên Hevrîşma Biyanî, Dersok- û Qedîfefroş, Hilberên Kitan û Mehfûran û hwd] (fîg 6. piştî 1840) yek ji wan navendên kirrîn û frotinê bû, ku çendîn teqebeyên wê hebûn.

Peydabûna taybetmendî yên nû yên mezaxgerîyê rastî serdema Vîktoryan hat; herçende vatişa fermî liser bingehê exlaq, hurmet û iffeta çîna navîn, bedewîya karakterê hundirî dida pêş, lê “yek ji taybetmendîyên berceste yên kalayan, seksualîzekirina û erotîzekirina wan bû, ku, ew jî para xwe, bi ser dêsmana psîkolojîk yan xwastekên mezaxgeran de kartêker bû, û tenanet diyarkerê çarçoveya wan xwastekan bû.” (Solomon-Godeau, A., 1996:113) Ji lewre ye ku, W. F Haug têrma serincrakêş ya “estetîka kalayê” afrand, ku wêneyê jinanî yê arizûkerane têde navendî ye. Û bi vî awayî ji sed salan zêdetir e, ku ev wêne bûye amblema temamker ya kalayê bixwe!

Paradoksa arizûya mezaxgeran ji alîyê Parker ve wiha dihête şirove kirin ”îdealeka nû ya jina kedîkirî di kultura çapkirî ya çîna navîna sedsala nozdehan de peyda bû. Ligor vê îdealê, jin divîya nefsbiçûk û mutewazih bûya û seksualîteya wê - nehatiba hezif kirin jî - bihata bêdeng kirin.” (Barker, H., 2005:86) Meyla vê boçûnê ew e, ku “sîstemeka rêsakirî jibo jinantîyê pêş biêxe, ku di vê sîstemê de jin, jiber girêdana wê bi kalayê re dibe subjekta alûgorê.” (Lysack, K., 2008:4)

Bêguman, seksualîzekirina kalayê hema ji nişka ve nehat, gewahê vê yekê kartên ticarî yên jinan ji sedsala 18an e, ku bo nimûne jineka çîna karker têde fêqîyan difroşe. (fig. 7, 1780). Lê sed salan bi dû re karta bazirganî ya Wholesale Taylor & Draper (fig 8) bi nîşandana teşeyê jinanî di cilûbergê şevê de, jinantîya mezaxgera jin berceste kirîye.

## JINÊN BAZIRGAN




**MATERYALÊN** nivîskî yên seretaya sedsala 18an gewahê hindê ne, ku hêj di vê serdemê de jin mijûlî bazirganîyê bûn. Enformasyonên liser van kartan ketwarekê sosyoekonomîk eşkere dikin; jinên bazirgan yên berê ne ji twêjên berz ên civakê bûn, berovajî, ew bûn yên ku ji bêgavîya aborî divîya alîkarîya hemserê xwe bikin, yan jî jinebî bûn, ku ji bêmecalîyê divêt jiyara malbata xwe bikirana. Yek ji kartên herî kevin (fîg 1), heger mirov li cilûbergên wê binêre, jineka çîna civakî ya xwartir e. Liser kartê deqeka sînorkirî bi sernavê “Buy my Dutch Biskets” [Bîsketên min yên Holandî Bikirre] xuya dike. Ev kart ji sala 1711an e.. Gelo ka ev jina, sermîyana malbatê bûye yan na, ji teksta kartê diyar nabe, lê wekî Berry destnîşan diket “Herçende tîpa herî berbelav ya binemalê liser cohtên zewicî hatibû navend kirin; lê sermîyantîya ji sedî 15ê benmalên Ingilterê wê demê ji alîyê jineka tenaxwe ve dihate kirin.” (Berry, H, 2005:204)

Yekemîn karta bazirganî ya rasteqîn kompanyayekê didete nasandin, ku xwedanê wê jineka bi navê Arabella Morris e. Karta bazirganî ya ku helmeta karsazîya vê xatûna froşyara tov û keresteyên çandinê, radixe ber çavan ji sala 1748an (fîg 2) e. Gava mirov li kujmê kelûpelên dabînkirî ji alîyê wê dinihêre, diyar dibe ku renge ew ji twêja yekem ya jinên bazirgan yên dewlemend be. Evca wê ev dewlemendî wekî cihêz hînabite malbatê, yan zelamê wê berî zewacê zengîn bûbît, ji hev ne têvel e; ev dewlemendî her wekî darayîya zelamî hatîye li qelem dan. Çewan Evans derdibirrît: “jin, bi darayîyên xwe ve, dibû milkê zelamî.” (Evans, T., 2005:58) Bi amaje li kommentên Sir Williams Blackstone liser Qanûnên Ingilterê [Laws of England] Evans herwiha radigihînit ku “bi zewacê re, zelam û jin lihember qanûnê wekî yek kesî dihatin dîtin: ango, hebûn, yan mewcûdiyeta qanûnî ya jinê piştî zewacê dihate hilawîstin, yan bi kêmanî bi ya zelamî re dihate têkel kirin yan ya zelamî dihate xurt kirin ... [darayîya wê] misoger dibîte ya zelamê wê, ku piştî mirina wî dibe ku bi temamî ji wê bihête standin.” (Heman çavkanî)

Karta din ya bazirganîyê çîrokeka serkeftinê ye; Eleanor Coade (1733-1821) (Fîg 3) helmeta xwe ya bazirganîyê bi kitanfroşîyê dest pê diket, lê paşê karê xwe hildiguherîte teşedana kevirekê destkarî, ku navê wê bixwe bû pênaseya kevirî. Serkeftina bazirganîya wê gewahê hindê ye, ku “hindek hemser jibo serkeftina ekonomîk a zelamên xwe diyarker bûne. Jinên elît exlebe status û darayîyeka şexsî ya berçav bi ermexan bo zelamên xwe dihînan, û gelek zelaman rêza wê çendê digirt.” (Evans, T., 2005:58)

Jinên ku ticareta zelamê xwe piştî mirina wî bi mîras dibirin, mezaxgerên xwe ji berdewamîya helmeta bazirganîyê di bin xwedantîya xwe bi xwe de agehdar dikirin, bo nimûne Arabella Brown (Fîg 3) ku jibo wê “berdewamîya patronajê û helbet jiyara jinebîyê bixwe, giring bû.” (Johnson, J., 2001). Di mijara (Fîg 4), de terzîya korset û cilên spehî, jinebî Mrs. Locke, daxwazê ji xwîşkînîya mezaxgeran dike, ku di jiyara neh zarokên wê de xwedî behr bin.

# Çend reformên ortografîk II



BEHROOZ SHOJAI



Di vî beşê gotara liser ortagrafîyê de, ji bilî çend amajeyên biçûk liser fonolojîyê, granî dê liser morfolojîya kurmancî be. Divêt bihête amaje kirin, ku polîsîya zimanî ya ku em dê di vê heftenameyê de peyrew bikin ne merc e, bi temamî bihête cî bi cî kirin. Divêt ev ketwara jî bihête liber çavan girtin, ku hindek nivîskarên ku jibo me gotaran rê dikin, xwedîyê boçûnine din in û nevên nivîsên wan bihêne edît kirin, boye, em dê wan dîtian berçav bikin û tenê heger kemûkurrîyên bariz yên îmlayî têde nebin, dê bi heman awayî biweşînin. Lê herçî nivîsên ku ji alîyê ekîpa Basê ve dihête amade kirin, em dê hewl bidin yekreng derêxin.

**Fonolojî**

R, ř yan rr

Dengên /r/ ku flap e û /ř/ ku trill e, di kurdîya kurmancî de du fonemên cuda ne, ango ne awayên dirkandina heman dengî, belkû dengên wataguher in. Eger cotek deng hebin ku wataya peyvê biguherin, hingê divêt di alfabeyê de temsîla wan hebe. Bo nimûne:

Flap: gur (bi wataya ajelekê dirrinde)

Trill: guř (bi wataya tund)

Di rastîyê de ji bilî du nimûneyên jorîn, mirov dişêt bi dehan cotên nimûneyan ku kalîteya dengê /r/ wataye diguhere peyda bike. Di alfabeya kurdîya soranî û alfabeya kirîlî ya ku jibo kurmancîyê dihate bi kar hînan de, ev her du deng bi awayê fonografîk hatîne destnîşan kirin, lê jibo ku di kurmancî de herfeka wisa zêde bibe, divêt konsensusek di navbera sazîyên kurdan yên bi zimanî ve mijûl dibin û zimannasên kurd de çê bibe. Ji lewre, em, bêyî ku hejmara alfabeyê zêde bikin, li cihên ku pêdivî be, vî dengî cot dinivîsin, ango peyva [gur] bi wataya ajelê dirrinde bi yek /r/ û ya [guř] em dê wekî [gurr] binivîsin.

Beşê fonolojîyê belkî di ayindeyê de bihête revîze kirin, lê vê gavê mijarên ku me gring dîtine ev bûn.

**Morfolojî**

Beşê morfolojîyê hem hestyar û hem jî pêdivî bi vekolînên dûr û dirêj heye. Bêyî xebatên senkronîk, ango hevdemî liser cografyaya diyalektên kurdî û diyakronîk liser proseya werara zimanê kurdî munaqeşe liser morfolojîya kurdî dirust nîne. Li jêrê çend xaline gring hene, ku me divêt em bi merema avakirina pirekê di navbera kurmancîya bakur û başûr de û herwiha parastina formên resen van guhertinan pêk bihînin.

**1)Ayindeya kurmancî (dema bihêt)**

Di kurmancî de ayinde bi awayê morfosîntaktîk dihête dariştin. Ji bo dariştina ayindeyê morfema "dê" berî prezensa konjunktîv dihêt.

**Ez dê bixwînim.**

Di piraniya devokên kurmanciya bakurî de "dê" bi subjekta risteyê re asîmîle dibe û dibe "-ê". Di analoji bi vê re, tenanet gava ku morfema "dê" bi tena sera xwe be ji wekî "-ê", "wê" yan "yê" dihêt. Di devokên başûrî yên kurmancî de morfema konjunktîv "bi-" jê dikeve. Stratejiyeka din ji hem asîmîlasyona "dê" û hem jî jêketina konjunktîva "bi-" di hindek verban de ye.

Ez dê biçim. (forma bingehîn)

Ez dê çim. (forma behdînî)

Ez´ê biçim (form liceyî)

Ez´ê çim. (forma torî)

Ji lewre tercîha me dê forma bingehîn be.

1)Izafeya navdêrê nenas (nebinavikirî) yê yekhejmar û pirhejmar

i)Di kurmancî de izafeya navdêrê nenas (nebinavkirî/belirsiz) di fraza navdêrî de bi du awayên cuda dihête derbirrîn. Di kumanciya başûrî (colemêrgî û behdînî) de wekî orjînal dimîne.

a)Behdînî/colemêrgî

| | Nêr | Mê |
|---|---|---|
| Nas | Mirov-ê qenc | Gul-a sor |
| Nenas | Mirov-ek-ê qenc | Gul-ek-a sor |

Lê di kurmancîya bakurî de izafe di bin bandora fonolojik ya –e ya berî –k de dimîne û rastî diyardeya mutasyona fonolojîk (umlaut) dihêt, ango izafeya nêr –ê di bin bandora –e ya –ek de dibe –î, û izafeya mê –a, di bin bandora –e ya –ek de dibe –e.

b)Kurmanciya bakurî

| | nêr | mê |
|---|---|---|
| nas | mirov-ê qenc | gul-a sor |
| nenas | mirov-ek-î qenc | gul-ek-e sor |

Ji lewre tercîha me dê forma sereki ango ya behdînî/colemêrgî be, ku têde mutasyona fonolojîk çê nebûye.

ii) Izafeya nenas ya pirhejmar di piranîya devokên kurmancî de wekî ya nas dihête nivîsîn, ku ev jî dikare di şefafîyet û diqqeta zimanî de kartêker be.

a)

| | yekhejmar | pirhejmar |
|---|---|---|
| nas | mirov-ê qenc | Mirov-ên qenc |
| nenas | mirov-ek-î qenc | Mirov-ên qenc |

Di nimûneya jorê de diyar dibe, ku nas û nenasên pirhejmar wekî hev dihêne nivîsîn. Lê hindek devokên kurmancî, bi taybet Berrîya Mêrdîn û Cizîra Qamişlo wan ji hev vediqetîne. Bi baweriya me ev forma resen ya parastî ye, ango bi vî awayî:

b)

| | yekhejmar | pirhejmar |
|---|---|---|
| nas | mirov-ê qenc | Mirov-ên qenc |
| nenas | mirov-ek-î qenc | Mirov-ine qenc |

Ji lewre tercîha me dê forma b) be, ku ciyawazîyekê di navbea nas û nenasa pirhejmar de destnîşan dike.

**2)Nivîsandin yan nivîsîn**

Nivîsandina forma kausatîv (hokarî) ya nivîsînê ye, ku armanca wê zêdekirina valensa verbê ye, ango hejmara beşdarên risteyê, ku bi argument dihête pênase kirin, zêde dike. Bi gotineka din nivîsandin, heçku mirov bi xwe nanivîse, lê bi yekî dide nivîsandin. Ji lewre tenê eger mebest jê hokarî be, em dê vê formê bi kar bihînin û jibo forma têper ya sade em dê bi tenê nivîsîn bi kar bihînin.

**3)Tune yan tine,**

Wekî berê jî hate amaje kirin, jibo negasyonê me forma [ti] hilbijartiye, ji lewre di şûna [tune] de em dê [tine] bi kar bihînin.

**4)Ligel yan digel**

Formên [ligel] û [digel] herdu di kurdî de hene. Piranîya cûreyên kurdîya navîn (soranî) [legel] bi kar dihînin, ji bilî devoka mukrîyanî ku [degel] bi kar dihînit. Herçî kurmanc in, yên ku vê peyvê bi kar dihînin, ango behdînî, urmiyeyî û colemêrgî, tenê forma [digel] bi kar dihînin, ji lewre tercîha me jî dê her ew bît, jiber ku ji bilî zimanê nivîskî ti devokên kurmancî daçek [ligel] bi kar nahîne.

**5)Awayê nivîsîna forma passîv**

Passîva kurmancî bi awayê sentaktîk dihête dariştin, ku têde taf, aspekt û modalîteya verba [hatin] tevî radera verba sereke dihêtê bi kar anîn. Pirsgirêk hingê derdikeve ku verb hevedudanî be, ango ji frazeka daçekî tevî verbê yan ji navdêr/adjektîvekî tevî verbê pêk hatibe. Bo nimûne verbên wekî [bi kar anîn], [rizgar kirin], [nimêj kirin] û [biryar dan]. Piranîya nivîsarên kurmancî gava ku passîvên van forman bi kar dihînin, wan pêkve dinivîsin. Heger em bo nimûne [hat bi kar anîn] wekî frazeka verbî pênase bikin, divêt di hengava yekem de diyar be, ka ew fraza verbî fînît (dem û aspekt û modalîte diyar) e, yan nefînît (bê dem, aspekt û modelîte) e. Herçî verbên fînît in, tenê sê formên wan hene, forma raderî wekî [top avêtin], forma partîsîpa borî [rizgarkirî] û partîsîpa niha [rizgarker]. Her du partîsîp wekî adjektîv dişên bihêne bi kar anîn. Û heger em raderê wekî navdêr bi kar bihînin, her du beşên wê divêt pêkve bihêne assîmîle kirin, ango [rizgar kirin] divêt bibe [rizgarkirin]. Bi wî teherî gava navdêrekê verbî wekî [rizgarkirin] çê dibe, êdî ne verbeka fînît e, di halê ku fraza verba passîv fînît e, ji lewre divêt ne wekî navdêrê verbî yê [rizgarkirin] lê wekî raderê [rizgar kirin] bihête nivîsîn. Ango ne wekî forma a) belkû wekî forma b) bihête nivîsîn:

a)Şengal hate rizgarkirin.

b)Şengal hate rizgar kirin.

Ji lewre, tercîha me dê forma b) be, jiber ku verba wê fînît e.

**6)Daçekên hevedudanî**

Daçekên hevedudanî di kurmancî de bi gelemperî yekîneyên semantîk yên cudatir ji herdu beşên pêkhîner ên xwe destnîşan dikin. Ango her du daçek bi hev re daçekeka nû bi bareke semantîk ê cudatir diafrînin, ji lewre tenê kombînezona wan bi hev re watedar e. Lê hindek caran jî du yekîneyên cuda yên semantîk in. Wekî:

Du yekîneyên semantîk: li ser maseyê

Yekîneyeka semantîk: liser mijarê

Ji lewre, gava ku ev daçekên hevedudanî yekîneyeka hevgirtî ya semantîk pêk bihîne, em dê wan bi hev re binivîsîn.

**7)Nivîsîna partîsîpa borî di verbên fînît de.**

Partîsîpa borî di kurmancî ji du morfeman pêk dihêt; rehê borî yê verbê, wekî mir-, xwar-, bir-, kir-, xwand- û morfema –î, ku bi wê partîsîp dihête dariştin, ango ew verb di forma partîsîpa borî de dibin mirî, xwarî, birî, kirî û hwd. Di kurmancîyên başûrî, nemaze behdînî, urmiyeyî û colemêrgî de ti ciyawazî di navbera partîsîp wekî adjektîv û partîsîp wekî pêkhînera verba fînît ya perfekt û plûperfekt de tine. Ango herdu jî bêyî guhertinên fonolojik dihêne nivîsîn. Wekî:

a)Wekî adjektîv:

zelamê girtî

b)Wekî partîsîpa perfektê

zelamî girtî-ye/ ez girtîme.

Di devokên bakurî de gava ku partîsîp parçeyeka verba fînît be, guhertineka fonolojîk bi ser morfema –î de dihête û kalîteya wê diguhere dike –i. Vê diyardeyê di nav zimanên îranî de tenê di kurmancî, ew jî ne hemî devokên wê de, rû daye. Jibo parastina forma resen û herwiha nêzîkkirina kurmancî bo cûreyên din ên kurdî, em tercîhekê dikin û wekî forma resen, ango wekî forma b) dinivîsîn.


8)Kesê yekem yê pirhejmar –în yan –in

Ji bilî hindek devokên kurmancîya bakur, di hemî cûreyên kurdî de – tenanet di kurmancîya Xorasanê de – kesê yekem yê pirhejmar ji her du kesên din yên pirhejmar cudatir e. Kesê duyem û sêyem bi awayekê morfolojîk bi morfema –in dihête destnîşan kirin lê kesê yekem wekî –în. Mixabin ev di piranîya devokên bakurî de nemaye û jibo hemî pirhejmara morfema kesdiyarkirinê –in e. Da şefafiyet û zelalî di ziman de hebe û resenê kurdî bihête parastin û herwiha cûreyên kurmancî nêzîkî hev bin, me tercî daye kesê yekem yê pirhejmar destnîşa bikin. Wekî:

Em diç-în, em dixwîn-în,

Lê hûn diç-in, hûn dixwîn-in.

Jibo vê carê ev têbînî têrê dikin, di hejmarên ayinde de, dema ku pêdivî be, em dê liser hindek xalên din ên ortografî û rêzimanê rawestin.



## MAKÎNAYA QATKERDIŞÎ YA KINCAN

**XEYALANÊ** zafê însanan ra yew zî no robot bî û o peynîya xebata 10 serreyine de ame ca.

Nameyê ey Laundroîd o. Hetê şîrketê Seven Dreamersî ra ame îmal kerdene û reya tewr verêne Fuara Teknolojî ya CESî ya Las Vegasî de ame daşinasnayîş.

Laundroîd, bi sayeyê teknolojîyê naskerdişê dîmenan kincan nas keno û înan yewbînan ra cîya keno. Dima kincan goreyê şeklanê înan yan zî goreyê wayîranê înan kategorize keno. Serekê Seven Dreamersî Shin Sakane persanê muxabîrê BBC rê wina cewab dano:

**Robot do key bivejîyo pîyasa?**

-Laundroîd do heta di aşman pîyase de bibo.

**Robot, kincan mabênê çend deqayan de qat keno?**

-Qatbîyayîşê yew parçeyî taqrîben 5-12 deqa rameno/domîyeno. Yanî tayê wext gêno.

**Kapasîteya ey çiqas a?**

-Kapasîteya Laundroîtî taqrîben 40 parçe kincan gore ya.

**Baş o, la beno ke qatbîyayîşê 40 kincan bi saetan biramo?**

- Belê, la şima do şewdir kincan dekenê makîna û engişta xo nanê bişkoja "startî" ra. Dima hes kenê şorê kare xo hes kenê biarisîyê, kincî do mabênê ê demî de bêrê qatkerdiş.

Shin Sakaneyî eşkera kerd ke heta di serran fonksîyonê kincan şutiş û ziwakerdişî zî do îlaweyê robotî bibê.

çime: bbc.com/turkçe





Merdimê ke dinya de ciwîyenê, 3yî ra 1ê înan emrê xo de vewre nêdîya.



Yew merdim/e temamê emrê xo de qaso ke do 3 rey dormeyê dinya ra ture bierzo rayîr şino/a.

## MODAYA 2017î (ZIMISTAN)

- **CAMÊRDÊ** ke bale antene ra hes kenê, tercîhê înan do no mewsîm zî parçeyê desenin bibê. Ê, do tena bale nêancê xo ser eynî wext de îspat bikê ke moda zî weş taqîb kenê. Modaya kiyafetanê camêrdan yê çîçeg deseninî ke çend serrî yo ke trend a emser zî dewam kena.




- **MA** nêeşkenê lacîwerd û keweyê kobaldî ra fek verabidê. Kincanê bineyî ra bigîrîn hetanî kincanê kokteylan, tonê keweyî do renganê serdestan yê emserî ra bibê.



## BOYA MASEYAN

**GELEK** xanimî, boya înan ver nêwazenê ke masayî bikewê zereyê keyeyê înan. La çare zaf asan o. Şima ke maseyanê xo werdî, leymune bigîrin destê xo û masa û dezgehê xo pê aye bivilênîn (mîşt bidîn) Dima ra zî leymune 5 sanîye verê adirê ocaxe de bigîrîn. Qabê ke şima tede masayî werdê yew parçeyê leymune zereyê înan de ronê û dest de makînaya xo ya firaqan bixebitnê. Boya maseyan êdî seba şima çîyêk îfade nêkena.

## HUNER







### "Recm"*

Nê enstalasyonî de (esero tedecakerde), welatê ke tede netewe-perwerî û dînî bi hawayo entegrekerde bîyê bingeyê heyat û sîstemê îdareyê înan, jenosîdo kulturîyo ke nê welatan de tetbîq beno ser o yeno vindertiş. Welatanê sey Tirkîya, Îran, Îraq û Sûrîye ke coğrafyaya Kurdîstanî mîyanê înan de ca gêna de, tedayê ke kurdan û sewbîna eqalîyetan ser o bene, hetê Ahmet Guneştekînî ra çarçewaya huqûqê "Recm"î de yenê persayîş.

***Ahmet Guneştekin, Momentum of Memory/Momentumê Vîrî ra yew eser** (Sergî, mabêne 29 adare - 25 tebaxe 2013 de çaçewaya Bîenalê Venedîkî yê 55. de akerde mende)

**Çime:** Ahmet Guneştekîn, Momentum Of Memory, GSM (Merkezê Hunerî ye Guneştekînî), Hezîrane 2013î (katalogê sergî)

ÎSMAÎL GUVEN

## Ceribê Milgramî



**STANLEY** Milgram, psîkologanê Unîversîteya Yale ra yew o. Şerê Dinya yê Dîyinî ra dima, 1961î de dewaya sucdaranê şerî yê Nazîyan ra yê Adolf Eichmannî dest pê kena. Milgramî na dawa ra hîrê aşmî dima, bi nê persî dest bi ceribê xo kerdo: "Gelo Eichmann û bi seyan çaplûsê ey ke qirrkerdişê Yahudîyan de ca girewtî, beno ke tena îtaatê otorîte kerdo û emrî ardê ca?" Û nê ceribê xo yê namdarî ra dima nîşanê ma dayo ke, merdimî her çend wîjdanan nerehet bibê zî peynî de îtaatê otorîte kenê û emran anê ca.

Û ma nika zî derheqê ceribî de malumat bide. Nê ceribî de hîrê kesî estê: subject (T), kaykerdox (L) û cigêrayox (E). Tîya de cigêrayox otorîte temsîl keno û emir dano. Subject mamostayî temsîl keno û emranê otorîyeyî ano ca. Kaykerdox zî rolê wendekarî kay keno û maruzê hişyarkeran ke mamostayî ra yenê, maneno. Nê ceribî de seba wendekarî kaykerdox vajîyeno, çimkî hetê cigêrayoxî ra malumat dîyayo ci û tîya de rol keno. La subject naye nêzano. Mabênê mamosta û wendekarî de dêsêk esto.

Destpêkerdişê ceribî ra ver, mamosta maruzê şoqêkê 45 woltî beno û bi no hewa derheqê şoqî de beno wayîrê malumatî. Dima ra lîsteyêkê çot-çekuyan dîyeno mamostayî. Ganî mamosta nê lîsteyî banderê wendekarî biko. Yanî wazîfeya mamostayî na ya. Coka mamosta hêverî wendekarî rê nê lîsteyî waneno. Dima ra mamosta her çotê çekuyan ra çekuya verêne û çar alternatîfan waneno û wendekarî ra wazeno ke mîyanê alternatîfan ra çekuya dîyin a raste bivîno. Eke wendekar cewabo şaş bido, mamosta şoqê elektrîkî dano ci. No şoq her cewabê şaşî reyde 15 wolt zêdîyeno. La eke cewab rast bo, mamosta derbazê çota çekuyan a bîne beno.

Mamostayî yanî subjectî ceribî ra xeberdar nîyê. Înan gore şoqê elektrîkî rast a zî dîyeno wendekaran. La rastî de şoq nêdîyeno wendekarî. Wedaya wendekarî de cîhaza qeydkerdişê vengî xebetîyena û pabesteyê makînaya elektroşoqî ya. Na cîhaze goreyê her sewîyeya şoqî vengê qîjîye vejena. No veng verî ra qeyd bîyo. Mamosta cewabanê şaşan ra dima woltajî çend rey zêdîneno. Wendekar destpêk de dêsî nucikî keno û nêweşîya qelbê xo ano vîrê mamostayî; la dima ra êdî cewab nêdano persan û vengê xo nêkeno.

Na nuqta de xeylêk subjectan waşto rewşa wendekarî bimusî û coka otorîte ra waşto mîyan bidê ceribî. Çend subjectî zî 135 wolt de vindertî û amancê nê ceribî xo ra persayê. Labelê zafê înan, temînat ra dima dewam kerdo. Temînat, yanî peyina nê ceribî ra berpirsîyarîya xo çin a. Çend subjectî zî qîjîya wendekaran ra dima huyayê û kerdenê ke stresê înan nîşan danê, ramojnayê.

Eke subjectî nuqtayêk de biwaştêne ceribî bivindarno, nê îqazê cêrênî dîyayêne ci.

1.Kerema xo ra dewam bikîn.

2.Ganî şima seba ceribî dewam bikî.

3.Dewamkerdişê şima rast a zî zaf muhîm o.

4.Sewbîna alternatîfê şima çin o, şima "mucburî" ke dewam bikî.

La eke subjectî nê çar heme îqazan ra dima zî biwaştêne ceribî bivindarno, cerib qedîyayêne. Eke subjectî nê îqazan ra dima hewna dest pê bikerdêne, cerib heta 450 woltî dewam kerdêne û badê qedîyayêne.

Sewbîna, ceribî de, seba persanê subjectî cimleyî dîyarkerdeyî bîbî. Mavaje eke subjectî bivatêne, wendekarî de hesarêko dewamî virazîyeno yan ney, no cewab dîyêne ci:

"Şoqî her çend dej bidî zî hesarêko dewamî nêvirazenê; kerema xo ra dewam bikîn."

Eke subjectî, lavakerdişê wendekarî bahane bikerdêne û biwaştêne ceribî bivindarno, no cewab dîyêne ci:

"Weşê wendekarî ya şoro yan zî nêşoro, ganî şima dewam bikerê ke heta heme çot-çekuyan bimuso. Coka kerema xo ra dewam bikîn."

Eke subjectî nê emrî qebul bikerdêne, 450 wolt hîrê rey pêdima dîyêne wendekarî ke şîdetê nê woltî bi asanî yew merdimî kişeno.

Milgramî ceribî ra ver mîyanê wendekar û akademîsyenanê Unîversîteya Yale de anketêk viraştbî û hema vaje heme beşdaran îddaa kerdbi ke, se beno wa bibo ma emrê otorîte qebul nêkenê û 450 wolt nêdanê kesî. Labelê peyina ceribê Milgramî eqsê naye vato. Çimkî 40 subjectan ra 26an yanî %65ê înan, her çend nerehet bî zî 450 wolt elektrîk dayo wendekaran. Û heme subjectan, sewîyeyêk de cerib vindarnayo û amancê ceribî xo ra persayê. Heta çend subjectan waşto ceribî bivindarnî û pereyê ke seba beşdarîya ceribî girewtê, peyser bidî. Labelê yew subjectî zî binê 300 woltî de bêteredut cerib canêverdayo. Û zafê subjectan gelek reaksîyonê stres û tersî nîşan dayê: areqîyayîş, degnayîş, gazkerdişê lewanê xo, nuzayîş, werdişê nenûgan ûsn.

Sewbîna wextan de gelek ceribê sey nê ceribê Milgramî virazîyayê û hema-hema eynî peyine vejîyaya. No cerib bi hewayêko eşkere nîşan dano ke merdimî verba emranê otorîteyî zeîf ê. Coka, ganî merdimî malumat yan zî emranê teberî parzunê aqilî ra bivîyarnî û dima ra qebul yan zî red bikerî.

## EDEBÎYATÊ KIRMANCKÎ RA:

# Şîîrê Açarnayeyî (1)



MUTLU CAN

WENDOXÊ erjayeyî ma wazenê ke ge-ge nê rîpelan de ca bidê edebîyatê ma zî. Ma tena nuştox û şaîran, kitab û kovaranê neweyan ser o nêvinderê pêserîya xo ya verêne ra zî bigêrê; kitab û nuşteyê ke serranê verênan de neşr bîyê, înan ra êyê ke hetê tarîxê nuştişê kirmanckî ra muhîmîya xo esta, bi muhtewaya xo yan zî sewîyeyeya xo ya edebî bale ancenê, înannewe ra biresnê şima, derheqê înan de şima bikê wayîrê melumatan. Eke ma hetêk ra zî bieşkê nê rîpelan vizêr û ewroyê edebîyatê kirmanckî mîyan de sey pirdêk bixebitnê û bi no qayde teqdîrê şima qezenc bikê bêguman ma do xo bextewer hîs bikê. Berîn ma nika ewroyî ra biewnîmê tarîxê edebîyatê ma ra û analîzo ke tede edebîyatê ma de cayê şîîranê açarnayeyan ser o yeno vindertiş û na çarçewa de melumato pêroyî pêşkêşê ma keno biwanîme. Ma do tena bi wendişe analîzî nêmanê nê rîpelî ra çend şîîranê çarnayeyan zî bikeyf biwanê.

**Şîîre tewr verênî ke ameyê açarnayene**

Ganî ez vêrê cû vaja ke çarçewaya melumat û tespîtê minê ke şima do cêr ra biwanê, netîceyê cigêrayîşê mino kemitarîxê nuştişê kirmanckî ser o kerdo ra sînorkerde yê. Kirmanckî de şîîre açarnayeyî yê tewr verênî tirkî ra açarnîyayê û nê yê: "Sinayişê To"(Sevdan Beni) û Zerre Dı(İçerde). Seke dîyar o nê di şîîrî yê Ahmed Arîfî yê ke bi tarzê şaîrîya xo warê şîîranê tirkî de bîyo wayîrê rêçêka xase. Baş o, kamî nê şîîrî açarnayê ? Nameyo ke sey açarnayoxê înan vejîyeno verê ma sey çend hebî waranê bînan M. Malmîsanij bi xo yo. Mamosta Malmîsanij key/kam wext ronişto û ê açarnayê? ma naye nêzanê la çîyo ke eşkera yo çime û tarîxê weşanayîşê înan ê. Nêşîîrî hûmara 3. ya kovara Devrimci Demokrat Gençlîkî (1978) de weşanîyayê.

**Sinayîşê to**

Ca dı nê verda wo, sinayişê tu, ez
Ge veyşan, ge teyşan mendo ez
Şewı tari yû dermat ow xayinı,
Gan lete lete...
Ow destê mı kelemçey dı,
Bê tetû, bê hewn mendo ez,
Ca dı nê verda wo sinayişê tu, ez...

**Zerre dı**

Pey hesıyay tı deso kerreyın?
Bero asınên, paça gurota,
Balışna mı, qarula mı, rêzıla mı
Rısmo ke ser'o ez mergi ver'a ageyra wo,
Pey hesıyay tı?
"Gorışmeçi" mı pıyazo kıho erşawıto,
Bûya qerenfılı dana cexra mı
Wusar ame w Koyandê Welatê mı.

***Ehmed Arıf***
***Tadayox: Malmisanıj***

***(Devrimci Demokrat Gençlik, sayı (hûmare): 3, Ankara, Nisan 1978, r. 14)***

Rêza kronolojîke ra gore reya dîyine ma kovara Tîrêjî ke eynî wext de sey destpêkê edebîyatê kirmanckî yê modernî hesibîyena de raştê şîîranê açarnayeyan yenê. Na kovare de zî di şîîrî ke tirkî ra açarnayeyê kirmanckî ser; hûmara 1. (1979) de "Ayê" (Onlar) , hûmara 4. (1981) de "Vile Kurdan" (Kürt Çiçekleri)ca gênê. Şîîra verêne yê Nazim Hîkmetî, a peyêne zî yê Huseyin Ferhadî [Hüseyin Hameş] ya. Sey ê verênan nê zî hetê Malmîsanijî ra ameyê açarnayene.



Nazım Hikmet

**Ayê**

**(Nazım Hikmet)**

Ayê kı herrı dı hında mıclewrı
aw dı hında masi,
hewa ra hında mılçıkan zafê;
teres, bêters, nezan, zanaye û gede yê.
Ow ayê kı mırênenê
hım zi vırazenê ê yê.
"Destan"ê ma dır mesele y inan tenya estê.
Ê yê kı pey bı dışmeni xapênê
û dışmeni raşte dı verdanê
vazdenê keyandê xwı.
Û ayê kı yew bedini erzenê xenceran fek
Û ayê kız ey yew dara kıhoy hıwenê
Û xwı vero bermenê
Û nengan çinenê bı mar û pirı,
"Destan"ê ma dır mesele y inan tenya estê.
Asın, komır û çol û oqyanoso hewz
Û sıudê rayıranê royanê derdênan
Herra ramıta û şarıstanan
Yew nımacê cûserra bedelêno.
Yew nımacê cûserra kişta tari ra
Key kı inan destê xwınê gırani herrı şanay xwı rast kerd
Ayê ke rısmanê eb weşan lilıkanê en rından sero
vırazenê ê yê.
Seserra ma dı inan zor da, zorê inan şı.
Zaf çiy vajey inan sero
Ow ina nrê vajıye kı:
"Rêzılanê ina nvişêr tebayê vin kerdışê inan çınnıko"

***Tadayox: Malmisanıj***
***(Tîrêj: Kovara Çandi û Pişeyi, hejmar: 1, İzmir, 1979, r. 36-37)***

**Vıle Kurdan**
**Huseyin FERHAD**

Serê şefaqi yo, roşn beno Rojhelat
"Cendırmey yenê" va yew domani (1)
Yew domani leheyf kaş kerd xwı sere
Tuf kerd / ard yew domani
"Cendırmey yenê" va yew domani
Yew domani, yew siy dekerdı qayişdê kelasungi
Nışka ra berma yew doman
"Berdel o" (2) va yew domani
Şırr xwı bın kerdı mizza xwı yew domani

Tirki ra tedayox. Malmisanıj
(1) - doman: gede, qeçek (qıj-qıcek), tut, put (putek), leyr. / Tirki: Çocuk
(2) -Berdel o: Verradı lo.
(3) –b'ewni, Yeni Türkü (Aylık Sanat Gazetesi), sayı: 2 (1 Mayıs 1978, sayfa:3)

***(Tîrêj: Kovara Çandi û Pişeyi, hejmar: 4,Swêden, 1981, r. 51)***

Dore de kovara Hêvî ke hetê Enstîtuyê Kurdan yê Parîsî ra çap bîya esta. Hûmara 3. ya na kovare (1985) de bi nameyê "Wa Suend Bo Wa Şirt Bo"(And Olsun Şart Olsun) û "Ca'deyanê Ma di zî"(Bizim Caddelerimizde De) di şîîrê Enver Gokçeyî weşanîyayê. Reyna hûmara 5. ya aye de bi nameyê "Heme bê Herri û Xwi ra Cêr Diyayey" (Külli Topraksız ve Horlanmış) yewna şîîra Gokçeyî neşr bîya. Tadayoxê nê her hîrê şîîran zî Malmîsanij o.



Karîn Boye



Heyran Xanima Dunbulî

Wa Suwend Bo Wa Şırt Bo
Enver Gökçe
Eke ez
wınî kerran û çalan miya dı mendo.
Eke ez tenya wo
eke ez xwi ra cêr diyaye wo,
bêpaştî yo ez eke û
eke wınî yo bextê mino sîya.
Bisuwend biqesem, wa suwend bo wa şırt bo
'ard di nêmaneno ecre mi.

**Ca'deyanê Ma Dı Zî**
**Enver Gökçe**

Mevajênê nêakena nêşina akera
caran na vila hinari,
Ku akera elbet ca'deyanê ma di zî,
Ku bibo roşan.
Çiqas ki winî ver bi gelî derg bibê
lulîyê çekan, destê teresbavan
peynîya peynîyan yew bi yew ku bişikiyê.

***Tirkî ra tadayox: Malmîsanıj***
***(Hêvî: Kovara Çandiya Gıştî, hejmar: 3, Parîs, Sebat 1985, r. 105-106)***


**Heme bê Herri û Xwi ra Cêr Diyayey (1)**
**Enver Gökçe**

Nîy awî geyrenê ha geyrenê
Qeresu, Murad, Çemişgezeg, Engu
û Mîran geyrenê ha geyrenê
Bi daran herran banan û mêrdimandê xwi
Laya Mîran ey ma
Teqena Koyanê Çeneqçîyan ra
û çimedê xwi ra
Rayan daran kendalanê xorînan miyan ra
çangilêna dekewena cêr
vaje henzar serri ra vîşêr o aw dana
herranê mayê cefakêşan
û Kurdî Alewî Xerraçî jiyenê (2)
bananê herrênan û xeyman dir
Dinya ra bê xebir
Roşneya lambaya qazaxî dir
hewnênê çimandê yewbînan miyan ra
bi taket-naket (3) bi hewayîş û tersayîşî reyra
Heme bê herri heme bê paştî
û xwi ra cêr dîyayey.

**Tirkî ra tadayox: Malmîsanij**

***(1) Enver Gökçe, "Külli Topraksız ve Horlanmış", Panzerler Üstümüze Kalkar, 2. Baskı, Doğrultu yayınevi, 1977, İstanbul***
***(2) jiyayîş (jiyayini): 'emir viyarnayîş***
***(3) taket naket: şubhe, şik***

***(Hêvî: Kovara Çandiya Gıştî, hejmar: 5, Parîs, Gulan1986, r. 92-94)***



Enver Gökçe

Hûmara 6. ya Hêvî xususen muhîm a. Çunke ma nimûneyanê verênanê ke tirkî ra teber yew ziwanî ra tadîyayê kirmanckî ser aye ra wanenê. Na hûmare de bi nameyê "Di Şaîrî" yew nuşteyê mamosta Malmîsanijî weşanîyayo. Mamostayî,qismê yewin yê nê nuşteyî ke tede derheqê Heyran Xanima Dunbulî* de melumat dayo,di şîîre aye yê fariskî û parçeyêkê şîîrêka aye ke Mihemed Cemîl Rojbeyanî açarnaya kurdkîya sorankî ser, açarnayê kirmanckî ser û eynî qisim de weşanayê. Bi no qayde ma eşkenê vajînke tirkî ra teber ziwano dîyin o ke ci ra şîîrî ameyê açarnayene fariskî ya, lehçeya kurdkî ya verêna ke -herçiqas parçêyêkê qij bo zî- aye ra şîîrêkameya açarnayene zî sorankî ya.

"Hûmayo! Bisilmaney helak bîy
Ciwanî debîy binde herri
Mare zerşikte û nalayey
Merdan şuwenê qeçekan vera
Hûmayo ! No bela hina vîşî biyo
Zerweşîya şarî hinî vîndî biya."

&

"La ti ya ki rindeya to qewete vîjnayîşî (îxtiyarî) mi dest ra girewto
Rîyê to ra ciyamendişî ver bexçey laleyanê zerri pullisiya
Xemê to ver, şaristane ganî xirabe bi
Riyê to ra ciyamendişî ver, asaneya zerri nêmendi
Ze gulistano ki vayêdo jahrin serra vêro
Veşê ciyayey ver, wesarê zerri bi payîz
La ez to re feda ba, roj û şewa min bê rindeya to
Kar û girwey zerri nika ax û nalî vîşêr çîyna niyo
Porê xo ra to dami ronaya, şamika xo ra zî (to) teney rokerdê (qandê seydbazey rê)
Qande şeyde zerri rê (to) xapi viraş ta
Tîrkemano ki kemana yê ra, riyê nazî ra erziya
Bewnî a game kişta zerri ra nişt
To qe yew ray zî neva ki ey zerrdevistaya min
Bê riyê min wextê zerri senî vêreno
Zerri nalay, felekî goşê xo girewtî
Ki qîrrîya min û ax û bermî zerri nêeşnawo
Heyran! Ay ciwanî zerra to tena to ra nêgirewta
Yêheti zey ê to hezaran reydi zerrî kewteye."


***[parçeyo cêrên sorankî ra ameyo açarnayîş. M. C]***

"Meverde kesê hewesperestî bêrênê dîwanê to
Şar meyesi domarê şekeri ra dûrî fîneno
Gulîstan ki çarey to yê gulrengênî diz ey şamik o
Tellu zerra mi di, ez sîneno ki to hetê qefes de ba."

**** [Şaîranê Dunbulîyan ra yew a. Mabênê 1790-1848î de ciwîyaya. M.C]***
***(Hêvî: Kovara Çandiya Gıştî, hejmar: 6, Parîs, Tebax 1987, r. 112-114)***



Malmîsanij



Ahmed Arif

Çend şîîrî ke serranê 1990an ra pey ameyê açarnayene

Weşano yewin yê nê termînî Kovara Nûdemî ya. Ma tede tena şîîrêka açarnayeyenêvînenê bîyografîya şaîra şîîre zî wanenê. Hûmara 1. (No:1, 1992) ya Nûdemî de Faruk Yakûpî şaîra swêdije Karîn Boye dayo şinasnayîş û bi nameyê "Hêş ı Dano" (Ja visst gör det ont) yew şîîra aye açarnaya kirmanckî ser û weşanaya. Ma netîceyê weşanîyayîşê na şîîre de fehm kenê ke ziwananê ewropîyan ra tewr verî swêdkî ra yew şîîre ameya açarnayîş.

**Hêş i Dano**

Êê, wûnî yo hêş dano çi wext gulovero nêdakerde akeno
qandê çiçî yo o çax, bihar qeleşey keno
qande çiçî yo o çax germey a hesretey a ma grêdanê bi serdey a tamê Tûjey ?
qab bî gulovero nêakerde heme zimistani
çiçî yo newe, zey qedya yo û teqya yo?
Êê, wûnî yo hêş dano çi wext gulovero nêakerde abêno
heşî qandê çiçî beno girdû çîyd yeno giroteni.

Êê, zehmeto çi wext gulovero nâakerde kewnê lerzayen a tersey a gran, bî yo bar
tepşeno xu bi dari di, maseno, rijênogiraney a înan. îna ancenocêr û senîn înan xu tepşenê
zehmet o bêqerer bîyayeni, tersey a û parçe
zehmet o naskerden a anceyayeni kûrey û serd fina zî, nêşîyayen û tenya lerziyayeni z
zehmet o waşteni vinderdişû waşten, kewno.

owextana o çax, her xirabo kes alîkarî nêkeno
zewqi qelişêno mîyanê yaqût û mircan di
gulover o bêakerde yê dari, zewq ra abêno,
zey mîyanê yaqût û mircanî di.
O çax tersey nêşeno xu tepşo,
mîyani jew biriqyayeni di kewno diropê (damle ye) dari
vîra kenê, senîn înan tersay newey ra
vira kenê, senîn înan tersay sefer kerden ra
jew sanîye di hîs kenê, bawerî ya xu girdi di
zey wûca di dinya ameyo viraşteyeni.

***(Karîn Boye, Vergernayîş: Faruk Yakûp, Nûdem: Kovara Hunerî, Edebî û Çandî, No: 1, Swêd, 1992, r. 103-104)***

(dewamê nuşteyî esto)

Ayê

NÛDEM

TİRÊJ
KOVARA ÇANDİ Û PİŞEYİ

Devrimci Demokrat Gençlik

HÊVÎ
KOVARA ÇANDÎYA GIŞTÎ

# Kurd kengê û çewan li Bexdadê hatine bi cî kirin?



ARAS CEWAD

Yekemîn cihê bicîbûna kurdên Feylî li Bexdadê li taxa Ezec bûye ku îro jêrê tê gotin Bab el-Şêx, wate dergehê Şêx Ebdulqadir Geylanî.

Ji bilî herêmên başûr û rojhilatê Kurdistanê, kurdên feylî li herêmên navend û başûrê Iraqê bi gitştî û bajarê bexdadê bi taybetî dijîn.

Em jî li vir dixwazin balê bikişînin ser çewanî û dîroka bicîbûna kurdên feylî li Bexdadê.

Çîroka taxên ku kurdên feylî lê dijîn tijî ye ji êş û nehametîyan, jiber ku xelkê resen yê wê deverê ne, lê bi biryarên zalimanê yên rejîmên Iraqê hejmara wan li wî bajarî hate kêm kirin û rastî zilm û zordarîyeka mezin û sûçên dijemirovatîyê hatine kirin.

Piştî ku Iraq hate azad kirin, kurdên feylî hêvî dikirin, mal û milkên wan yên ku ji alîyê rejîmê ve hatibûn desteser kirin, paşve bo wan bihêne vegerandin û ew jinûve vegerin ser mal û milkên xwe li Bexdadê.

Lê mixabin bêyî ku di rewşa jîyana wan de ti guhertinek çê bibe vegerîyan ser malên xwe û ew vegera wan jî bi wî awayî nebû ku wan xeyal dikir, çimkî jibilî desteserkirina mal û milkê wan, warên wan jî hatibûn wêran kirin.

Sedama bingehîn ya wê wêrankarîyê rejîma Bees bû ku bi zanebûn cî û warên kurdên feylî li Bexdadê ihmal kiribûn daku mal û milkên wan hirşin û çi şûnwarekê wan nemîne, lê tevî wê jî û heta nivîsîna vê mijarê jî kurdên feylî beşeka gring ya civaka Bexdada payetexa Iraqê ne.

Liser yekemîn cihê bicîbûna kurdên feylî li bexdadê Dr.Imad Ebulselam Reûf dibêje ''yekemîn cihê bicîbûna kurdên feylî li Bexdadê taxa Ecez bûye ku îro jêre tê gotin Bab el-Şêx wate dergehê Şêx Ebdulqadir Geylanî.

Bab el-Şêx wê demê yek ji taxên qelebalix yên bajarê Bexdadê bûye. Dema ku Şêx Ebdulqadir Geylanî (1077-1166) di warê zanist û sofîtîyê de navdar bû. Hindek ji şagirdên wî yên wekî Cîhangir el Kurdî, Şêx Macid kurdî, ku kurd bûn di mezinkirina medreseya Şêx de havkarîya wî dikirin. Paşê jî ew medrese bi Terîqeta Qadrîye hatîye naskirin'.

Navbirî herwiha dide zanîn ''di sedsala 11an de li Bexdadê taxek hebûye bi navê taxa kurdan. Ev zanyarî di pirtûka Elmuntezem ya dîrokzan Ebdulerehmanê kurê Cewzî jî hatîye û têde qala lehîyekê dike ku li bajarê Bexdadê de rabûye û taxa kurdan di bihara sala 1062' de de wêran kirîye.

Di pirtûka Şemsedîn Samî de jî hatîye gotin ku kurdên feylî bingeha esasî ya xelkê lorin û beşek in ji gelê kurd .

Di rastîyê de yekemîn dîroka kurdên feylî vedigere sala 1402an dema ku artêşa Teymûrê leng êrişî bajarê Dizfûlê û herêmên sakî û feylî kir û mal û milkên wan talan kir. Ev mijar di beşa dûyem ya pirtûka Zefername de ji alîyê dîroknas El-Îzedî hatîye qal kirin û dibêje ''dema ku artêşa Teymûrê Leng li herêma Dizfûl derbas dibû, hemû sewal û pezên xelkê sakî û feylî talan kirîye''.

Kurdên feylî rûniştvanê qedîm yê bajarê Bexdadê ne û li navend û derdora bajarên navend û başûrê Iraqê belav bûne û jiber sûrgûnên bi darê zorê, zextên rejîman rewşa aborî û civakî yên weke iş û hevjînîyê û karesatên xwezeyî neçar bûne her tim koçber bibin.

Ji alîyekî dî ve kurdên feylî ji alîyê hikûmdarîya osmanî hikûmetên padîşahî û desthilata komarî, ku sîyaseta nejadperestî birêve dibirin rastî zulmeka bê hempa hatine.


Yek ji rastîyên dîrokî yên serdema osmanî peymannameya bi Îranê re bûye ku bûye sedma parçekirina axa Kurdistanê û malbat û hoz û eşîrên kurd ji hav hatine qut kirin û liser axa her du dewletên Osmanî û sefevî de hatine parve kirin.

Vê yekê jî rewşeka nû ji alîyê civakî û têkilîyên malbatî ve anî holê û bû beşek ji sîyaseta hikûmdarîya Osmanî û Sefevî û piştî wê jî Îran û Iraqê ku ew jî bû hincetek ji bo desthilata Iraqê jibo qutkirina têkilîyên hoz û malbatên parçekirî di navera her du welatan de, ku beşeke mezin ji wan kurdên feylî bûn.

Herwiha hatin û çûn û serdan kirina malbatan li ser sînorê her du welatan ji alîyê kurdên feylî ve weke xîyaneta niştîmanî hatin hejmar kirin û cezayê wê jî mirin bû ji wan re.

Li derbara bicîbûna kurdên feylî li Bexdadê de di pirtûka Şerefname ya Şerefxanê Bedlîsî de hatîye gotin ''dîroka kurdên lorî yên feylî li Bexdadê vedigere bo dîroka kevn û di rêya serok Zulfeqar Nexûd Kelhorî di navbera salên(1523-1529) de hikûmdarîya Bexdadê xistine destê xwe û bajarê Bexdadê birêve birine''.

## Di çavkanîyên dîrokî de nîşeneya hebûna kurdan



Yekem nişaneya hebûna kurdên feylî li Bexdadê di çavkanîyên inglîzan de jî vedgere sala 1744'an de. James Fraser di wê derbarê de dibêje ''kurdên lorî demeka dûr û dirêj li Bexdadê bicî bûne.''

Ew nîşan didin xûya kirin ku kurdên feylî çendîn qirnan li Bexdadê û çend hermên din yên Iraqê niştecî bûne.

Çavkanîyên dîrokî wê yekê nîşan didin ku çendîn tax û kolan û mizgeftên cuda yên bexdadê navên kurdî liser de hatîye danan. Wekî mînak taxa Tepekurd ku dikeve nabera her du taxên Meydan û Keraxul.

Herwiha taxek din jî bi navê Taxa Kurdan "Mihel Ekrad" jî li wê derê hebûye û sedama bicîbûna malbatên kurd li wê deverê ew bûye ku zilamekê kurd yê bi navê Mihemed Emîn naskirî bi Baş Îmam nêzîkî 14 xanî li wê taxê kirîye û ew xanî bi ser kurdan de parve kirîye.

Paşê hinek kesên din jî hatine wê taxê û bûne piranî di wê taxê de. Lewra muxtarekê kurd bo wan hatîye destnîşan kirin û bi vî awayî bûye dûyemîn taxa kurdî li Bexdadê piştî taxa Bab el-Şêx.

Jone Acher vekoler û nivîskarê inglîzî di sala 1864'an de serdana Bexdadê kirîye û di pirtûkekê bi navê Rêvingîya Iraqê de dîyar kirîye ku kurd li wî bajarî de dîtîye, lê taxên kurdî destnîşan nekirîye.

Taxek din yê Bexdadê taxa Tesabil bûye ku warê kurdên feylî bûye û têde mizgeftek hebûye bi navê mizgefta Tesabîl, ku taybet bûye bi kurdên feylî. Lê ji alîyê rejîma Bees ve ve hatîye rûxandin û liser nexşeya Bexdadê hatîye paqij kirin dakû tu navnîşanek ji kurdên feylî li wê deverê de nemîne.

# Nerîtên stran û muzîka lorên Rojhilatê Kurdistanê

EZÎZ EHMED

Li Rohilatê Kurdistanê muzîka kurdî ji bajarekî heta bajarekê din ji hev cud ye; bitaybet muzîka bajarên Loristanê, ku zêdetir alavên wekî tembûr û kemançe bikar dihînin. Awayê helbestên stranên wan jî ji bajarên wekî sine, Urmiye û mehabadê cudatir e.

Kevntirîn şûnwar ji alîyê stran û govendên kurdî li Loristanê peyda bûne. Li gor vekolînên şûnwarnasî li herêma Loristana rojhilatê Kurdistanê dîmenên govenda kurdî liser çîyayekî hatîye peyda kirin û dîroka wê vedigere 4 hezar salan berî zanyînê. Herwiha dîmenên amûrê tembûrê liser amanekê zîvîn hatîye dîtin, ku dîroka wê vedigere serdema sasanîyan.

Stranên herî navdar yên lorî pêk hatîne ji strana Qedemxêr, Rengîne, Kewştela, Pêlawzêrîn, Senemgul û Halû Genimxir e.

**Muzîk û stranên evîndarî**

Ev stan ji bo gihîştin û ji destdana yar û hezkirîyan dihêne stran û stranên navdar jî bi vî awayî ne; Hey Lo, Bîna Bîna, Kêwdar, Şîrîn û Xusrew û Mîrûne.

**Stranên cengawerî**

Ev cûre stran ji bo meht û çîroka jêhatîbûna cengawerên nav êl û tayfeyên lor wekî strana Cenge Loro û Daye Daye Wextê Ceng e.

Armanc ji gotina stanên cengawerî di nav loran de teşwîqkirin û moralbexşîna eşîretan, jibo beşdarîkirin di nav meydanên şer de, herwiha, ji bo bîranîna kesayetîyên cengawer yên lor bûye, û bi du awayên bê awaz, wekî meqamên Seherî, Neqare û Şare Ra û bi awaz jî wekî Daye Daye ye.

**Lorînên yan stranên şînê yên loran**

Ev cure stran ji qedîm heta niha di merasimên şîn û serxweşîyan de dihêne lorandin û bi du awayên bê awaz û bi awaz dihêne pêşkeş kirin; yên bêawaz wekî Çemerî, Seherî û Paktelî ne û yên bi awaz jî, wekî Rara Şîrazî, Rara Pêşko û Dingdal e.



**Stranên werzî**

Armanc ji stranên werzî yan demsalî, ew stran in ku di dema koçerîyê û di demsalên salê de dihêne stran û pêk dihên ji strana Berze Kuhî, Koçbar û Milejêrî.

Li gorî gelê lor her werzekî muzîk û straneka taybet bi xwe heye, di werzê biharê û di dema vegera êlan ji zozanan jî, govend, stran û dîlanên taybet yên gelê lor heye.

**Stran bo kar û pîşeyan**

Ev cure stran, bo teşvîqkirina zilam û jinên lor e, ku di dema kar kirinê de dihêne stran û bi awayên koro û solo dihêne performe kirin, wekî Gul Drow û di dema dirûtin û çandinê de strana Hole û herwiha çendîn stranên din jî heye ku di dema xermankutan, şîrdotin û meşkkiyanê de dihêne pêşkêş kirin.

**Stranên komedî û rexnegirtinê**

Ev cûre stran wekî ruswakirin û şermezarkirina kes yan jî cîyekî dihête bi kar anîn wekî Henbat û Kasimsa.

**Stranên olî û irfanî**

Ev cûre stan, alîyê wan yê mîstîk heye û pêk hatîye ji stranên wekî Serayê Xamûşan û 12 Kelamên Yarî. Di dema gotina van kelaman de, gelê yarsan amûrê tembûrê bi kar dihînin ku wekî amûrekê pîroz yê kurdan dihête nasîn.

# VENEZUELA
# Di hingava birsîtî û şoreşê de



Piştî ku qeyrana aborî hê zêdetir bû êdî kesên ji çînên berjêrtir jî ji welat derdikevin. Dihêt texmînkirin ku tenê sala çûyî zêdetirî 150.000 kesan ji Venezuelayê reviyane.

**HAVÎNA** 2016an, otomobîla BBCê rastî barîkadekê dihêt. Şax û çûqlên ji daran jêkirî û pelên wan hê jî şîn in li nava cadayekê hatine nijinandin. Kesên lipişt vê barîkada biçûk ne xort û ciwanên rûpoşkirî, ne zilamên bi hêrs û drûşmder, ne girseyeka mezin a bi al û pankartên siyasî, dar û alavên pevçûnê ne. Van kesên ku hejmara wan encaq digihêje sî çil kesan pirranî jin û zarok in. Bizota di nava wan de veneguherîye alavên gurr ên wêrankarîyê. Derdê wan, daxwaza wan nan (xwarin) e. Li welatekê ku zemanekî welatê herî zengîn ê Amerîkaya Latîn bû ew jî wekî her kesî ketine ber pencên xizanî û xelayeka mezin: xwarin tune. Zarokek tekane xwareka ku bi dest dixin, mangoyine ji daran jêkirî ye, dimije.

Li bajêr bi hezaran kes liber dikanan dikevin dorê ji bo ku karibin tiştekî bistînin. Rêza wan bi kîlometreyan dikişe liser peyarêyan û ew dor bi saetan naqede, heta derengî şevê. Baran dihêt, xelk sîwanên xwe vedikin û liber wê baranê li bendî disekinin ku têkevin hundir, ji xwarina bi sînor a li welat maye wê kêma ku para wan ketîye bi dest bixin. Liber kaseyan karmend carina Bolívarên (pereyê Venezuelayê) ku enflasyona bilind ew ji qîmet xistîye nahejmêrin, tenê diwezinînin bo ku miqdarê wan bizanin. Xelkê piştî ku tiştek bi dest xist jî vê carê kula ku ew dê çiqasî têra wan bike di dilê wan de zîl dide. Li hin cîyan refên marketan bi temamî vala dibin û xelkê birçî û bêhêvî jî kerban bi hundir dikevin û her tiştî xera dikin.

Li malekê jineka jar û zeîf telefoneka kevn î xilmet a destan, ser û sincê wê wekî malê xurde jihevketî, derdixe û sûretê jineka bi goşt û gewde, bi beşereka vekirî dikene, nîşan dide û dibêje: "Ez berê wiha bûm!" Qilafetê wê ê ku ji birçîna maye çerm û hestî wekî pelekê hişk dilerize.

Komara Bolîvarî a Venezuelayê di 5ê Tîrmehê de roja xwe ya serxwebûnê pîroz dike û leşkerên vê dewleta rezervên wê yên petrolê ji ên her welatekê dî ê cîhanê zêdetir in di rêwresmê de bi yekdengî diqîrin : "Somos socialistas, anti-imperialistas, y también chavistas!"

### Collectivos

Kolektîfên Bolîvarî ên ku piştî wê serdemê ji keç û xortên sivîl ên taxan hatin ava kirin bûn wekî pasdarên rejîmê û bi çekan û cilên leşkerî li nava taxan konê xwe danîn. Ev yekîne hatin peywirdar kirin bo şopandina gihaştina alîkarîyan ji xelkê re, ku bi saya wan piştevanîya girseyan a ji rejîmê re dihêt xurt kirin. Lê ev grûp tenê serperiştîya belavkirina xwê û şekir nakin ku di ambalajên bi sembolên şoreşê de hatine pêçandin û liser wan xaleka destûra şoreşî hatîye nivîsîn a ku dibêje "mafê her kesî ye bigihêjin xwarin û xizmetên perwerdehî û tenduristîyê." Ev komên pasdaran radigihînin ku parastina Chavîzmê û rejîmê jî dikin û eger bibînin ku Maduro, serokê wan î piştî Chavéz, jî ji xeta Chavîzmê derdikeve û tiştên li dijî şoreşê dike ê li ber wî jî rabin.

### Piştî Chavéz

Hugo Chavéz, yekemîn serokê sosyalîst ê Venezuelayê, ji Venezuelayîyan xwast ku piştî wî dengê xwe bidin Nicolas Maduro û wî bikin serokê xwe bo ku şoreşa wan a Bolîvarî bidomîne. Jibo Maduro mimkun nebû bigihêje populerîteya Chavézê ku digot: "Carina dengek ji min re dibêje "Chavéz, tu êdî ne Chavéz î. Tu êdî milletek î. Tu hemû millet î."" Li Venezuellaya ku di rêjeya kuştinan de di cîhanê de di pileya sêyemîn de bû û xwedî rêjeya herî bilind a enflasyonê bû li tevahîya Amerîkaya Latîn, rewşa siyasî, aborî û civakî xerabtir bû. Dawîya vê salê gava serokatîya dewletê biryar da ku banknotên 100 Bolívarî, yek ji banknotên herî mezin, ji piyaseyê rake (bi hinceta ku DYA wan dide hev û li Amerîkayê li derveka taybet wan hiltîne jibo ku derbeyeka aborî li vî welatî bixe), careka dî diyarî çavan bû ku aborîya welat, pergala bankerîyê û krîza siyasî ketîye bin nîrekî çiqas giran. Hemwelatîyên ku ji nişka ve bi vê nûçeyê hesîyan û 24 saetên wan hebûn bo ku wan banknotan biguherînin, li ber ATMyan ketin dorê, lê ATMyan di bergîya van pereyan de dîsa heman banknot didan xelkê.

Mixalifên ku dibêjin em doza "nan û azadî"yê dikin û digel ku di parlemanê de pirranî ne jî çi biryara ku derdixin nahête peyrew kirin û her tişt liber rehm û kerema hêzekê ye, dixwazin rejîma Chavîzmê ji holê rakin û tiştên ku van desthilatdarîyan kirine bi şûn de vegerînin. Dubendî û berberîya navbera hikûmetê û muxalifan ewqas tûj bû ku dawîya sala borî herdu alîyan qebûl kir ku Vatîkan têkeve nava wan û wan li hev bîne. Lê wekî Venezuelayîyek dibêje, her tişt ewqas ji 'adet derketîye ku "Xwedê jî nema dikare tiştekî bike" ji bo wan.

### Rev û dîaspora

Piştî ku Hugo Chavéz bû desthilat wahd kir ku ê elîtên ekonomîk ji holê rake û mal û milkên wan li feqîran belav bike, dewlemendên welat û kesên ji çîna navîn ji welat revîyan û belkî yekemîn dîasporaya Venezuelayîyan pêk anîn. Piştî ku qeyrana aborî hê zêdetir bû êdî kesên ji çînên berjêrtir jî ji welat derdikevin. Dihêt texmînkirin ku tenê sala çûyî zêdetirî 150.000 kesan ji Venezuelayê revîyane û evana pêla duyem a dîasporayê pêk dihênin. Venezuelayîyên ku berê wekî tûrîst diçûn Curaçaoya ku giraveka li Karîbyayê ye û pere li wir xerc dikirin, vêga bi qeyîk û motorên kevn ên qaçaxçîyan li deryayê dixin û bi rêwîtîyeka metirsîdar hewil didin xwe bigihînin perrên vê giravê bo xwarin û xebatê.

## XEWNEK



**SÎMON** Bolívarê Venezuelayî di çaryeka pêşî a sedsala nozdehan de pêşengîya tevgera serxwebûnxwaz li Amerîkaya Latîn kir û gelek welatên li vir ji bin hukmê spanyolan derxist. Dixwast ku welatên Amerîkaya Spanî hemû bibin federasyoneka wekî a Dewletên Yekbûyî a Amerîkayê lê zûka fahm kir ku ev ne tiştekê rasteqîn e li vî parçeyê kişwerê Amerîkayê. Yekîtîya ku bi navê Kolombiyaya Mezin (Venezuela, Kolombiya, Panama û Ekuadora îro) ava kiribû xwe negirt û ji hev belav bû. Dema dev ji karê xwe yê serokatîya vê yekîtîyê berda daxwaza wî ya dawî ji hemwelatîyên wî ew bû ku "yek bin û yek bimînin", lê ev yek mimkun nebû. Bolívar di dawîya serokatîya xwe de têgihiştibû ku "kê xizmeta şoreşê kiribe wekî li deryayê cot kiribe," piştî ku di 1930yî de istîfa kir xwast biçe Ewropayê sirgûnê. Alav û defterên xwe di pêşî re şandin, lê berî ku ji Cartagena (Kolombiya)yê bi rê keve canê xwe ji dest da û koça xwe ya dawî kir.

## HUGO CHAVÉZ



**HUGO** Chavéz ji 1999an heta mirina xwe ya ji kanserê, 2013, çar serdeman wekî serokê Venezuelayê hat hilbijartin. Gotara wî ya jibo feqîr û belengazên welat populerîteya wî zêdetir kir û bi şêwaza xwe ya cihêreng hem li welatê xwe hem li cîhanê nav û dengekê taybet da. Chavéz berî ku bibe serok fermandarek bû û di dema desthilata xwe de jî hez dikir cilên leşkerî li xwe bike. Di 2002yan de serbazên artêşê ên ku ji desthilata wî nerazî bûn alozîya li welat û protestoyên sivîl ên ku bûn meydana kuştina gelek sivîlan ji xwe re kirin mane û darbeyek li hember wî kirin. Chavéz qebûl kir ku wî desteser bikin lê piştî ku serîhildan li hember girtina wî hatin kirin û hikûmeta nû piştgirîyeka zêde wernegirt cardî vegerîya ser postê xwe û ji berê radîkaltir bû.

CIWANMERD KULEK

## Zimanê kur û nevîyan



Ez şeş salî bûm, mala me ji gund rabû. Dema piştî wê rojê cara yekem vegeriyam gundê zarokatiya xwe, êdî xwendevanekî zanîngehê bûm. Tişta pêşî ku bala min kişand ew bû ku gundê me pirr piçûk bûbû. Kûçe bi qandî ku di bîra min de mabûn ne fireh bûn, Kurra Zava bi qandî ku dihat bîra min ne dûrî mala me bû. Çahla hewşê bi qandî di zarotiya min de ne kûr bû, sergoyê pêşiya malê, holika li beramberî heremê kalê min ne ewqas bilind bûn. Xanî, ne ewqasî mezin bûn. Panzdeh sal derbas bûbûn û ez mezin bûbûm. Bîranîn tiştekî çiqas zengîn û bêsînor bû, vê yekê ez wek pelekî hişk hejandim.

Ez di deriyê hesin ê li şûna deriyê textîn ê mala me ya berê re ketim hewşê û di pêlikan re hilkişiyam. Kalê min, bavê bavê min, pişta wî li dîwarê metbexê, gopalê wî li kêleka wî, li ser tejikeke kevn î peritî li bernigê rûniştî bû. Berê wî li Kurra Zava, li alîyê bênderan bû. Bi çavên xwe yên ku êdî xweşikayî ber xwe nedidîtin li asoyeke ku pirranîya temenê xwe yê sed salî tê de çûbû û hatibû dinerî; çiqas dixwest ku ez bibim diktorekî çavan ji bo van çavên ku yekane nexweşiya wî ya di temenekî dirêj de bûn. Lê êdî ji lep û qawet ketibû, nikaribû rabe ser xwe, belkî bênder û Kurra Zava jê re ji qandî dema zarotiya min bêtir dûr bûbûn. Min jê pirsî ku Şerîfe (jinapa min) li kû ye. Riya wî ya spî bi makînê hatibû qusandin. Rûyê wî yê gewr û mezin bêliv man. Nizanim dengê li pişt rûyekî ku bi salan bû nedidît nas kir yan na. Dîtina min dît, lêvên wî hêdîka, bi kotekî, ji ser hev çûn û liviyan û hevokeke sê-peyvî ku ê tu carî ji bîra min neçûya ji wan derketin: "Çû nav bîstên."

Wê pêlê min nû dest bi xwendin û nivîsîna kurdî kiribû, herçî tiştên bi kurdî ku min dibihîstin weke keşfekê bûn ji min re. Lê cara yekê bû min ji derdora xwe ne peyveke nû, min struktureke nû a zimanî dibihîst. Di malbata me de tu kesî peyva 'bîstan' netewandibû heta wê rojê! Ji alî tewanga peyvên nêr de tenê ev mabûn di destê me de: bajar/bajêr, çiya/çiyê. Evê tewanga kalê min derbasî zaroka herî mezin a kalê min jî nebûbû û ev struktur bi bavê min re jî nemabû yan hîç çênebûbû. Regezeke zimanî a belkî sed yan hezar salî, ji bo vebijartin yan ravekirina tiştekî bi rengekî taybettir û cihêrengtir li nav ziman karek pêk anîbû û mantiqeke xwe durist kiribû, piştre lawaz bûbû û hatibû di navbera nifşekî de qut bûbû.

Struktureke dî ya zimanî ku ez pêşî di kitêban de fêr bûm dû re min di malbata xwe de dît jî xwedî heman çarenûsê bû. Bavê min wexta pirrejimariya navekî dikir di nava ravekekê de wiha digot: "hevalêd wî (hevalê di wî)", "derdêd min (derdê di min)". Evî formê ku ji dêvla awayê "hevalên min", "derdên min" bi kar dianî negihiştibûn zaroyên wî. Ne min, ne xwehên min î mezin kesî ji me wiha nedigot. Dîsa strukturek hatibû û di navbera bav û zaroyan de gotibû "qurp" û şkestibû!

Herdu guhertin jî di derdorên ku kurdî zimanê serekê û yekane ê jiyanê bû de pêk hatin. Movikên çarenûsa zimanekî di navbera nifşan de ne û her tim nifşên di pey re berê ziman didin vî aliyî yan wî aliyî.

Di halûmercê îro de ku kurdî hem ji perwerdeyê û hem ji jiyana malbatî bêpar dimîne, tişta herî zêde em xwe dispêrinê ev e: Zimanê bav û kalan. Û em dibêjin em çiqas zimanê bav û kalan bi kar bînin, çiqasî dirêçika wan de bimeşin em ê ewqas nêzîkî sirûşt û reseniya zimanê kurdî bin. Lê her bav û kal zemanekî tenê kur û nevî bûn û di tu dewr û zemanan de kur û bavan bi temamî bi a bav û kalên xwe nekiriye û li ser xeta wan nemane. Ziman jî bi qandî ku mana li ser vê xetê ye, derketina ji vê xetê ye jî. Tişta siruştî ev e. Resenî ev e ku mirov gerr û tevgerra vê siruştê ji serî de û ji binî de zincîr neke. Meseleyên zimanî ên wek kişandin/kirpandina lêkerê li gor bireserê (object) ("min ew dît" / "min wî dît"), tewang, ergatîvîte, binavkirina hin tiştan yan bikaranîna peyvekê bi awayekî diyarkirî, ev mijar di hin halûmercan de tên ciyekî wusa ku tu derman û reçeteyên bav û kalan bi kêr nayên. Bav û kalên me tucarî di halê me de nejiyan û tiştên ku em bibêjin derneketin pêşiya wan yan pêwîst nekir ji bo wan. Carina werarbûna masûlkeyeke lêvî jî ji hemû rêçik û regezên berê kartêkertir e di diyarkirina tiştekî zimanî de.

Pêvajoya di navbera du nifşan de ji her demê xedartir bûye. Êdî di navbera bavekî û kurekî de em behsa guhertina tiştekî zimanî nakin, em behsa jinavçûn û windabûn ziman dikin. Zimanê bav û kalan najî, zimanê kur û neviyan dijî. Gelo ê kur û neviyên me bi kurdî biaxivin? Ê kurdiyeke wan hebe, ku xem nake çiqasî wek a me ye çiqasî ne wek a me ye?



**FIRAT CEWERÎ**

## Sirgûn û edebiyata kurdî

**GAVA** mirov li sebebên sirgûnbûna kurdan difikire, tiştek bala mirov dikişîne; ew jî ew e ku gelek gotinên hevbeş yên sirgûnê di zimanê kurdî de bi cih bûne. Piraniya van gotinan jî ji zimanên serdestên kurdan derbasî zimanê kurdî bûne. Gotina “sirgûn” bi xwe ji gotineke tirkî tê, îro bi devokên cihê be jî, di kurdî de rûniştiye û ji aliyê piraniya kurdan ve tê bikaranîn. Gotina “nefî” jî ji erebî ketiye kurdî û ew jî ji aliyê beşekî mezin yê kurdan ve tê bikarnîn. Sirgûnî, sergomî, nefîbûn, koçberî, mişextî, xerîbî, penaberî, akincîtî hemû hevmaneyên sirgûnê ne. Di kêm zimanan de evqas gotinên hevbeş ji bo sirgûnê hene. Sebeba vê yekê jî diyar e; ji ber ku kurd hertim sirgûn bûne, ji cih û warên xwe hatine derkirin û dûrî welatê xwe ketine. Yên ku kurd ajotine ser vî celebê jiyanê jî berberiya kurdan ya hundirîn, şer û pevçûnên eşîrî û bêguman sebebên bingehîn serdestên kurdan bûne.

Digel şaîr û nivîskaran, siyasetvan û xelkên normal jî sirgûn bûne. Ji ber ku mijara me bêtir li ser çapemenî û edebiyatê ye, ez ê dûrî mijarê nekevim û bi kurtî di behsa edebiyat û çapemeniyê de bimînim.

Sirgûn ne bi tenê bûye qedera nivîskarên kurd û edebiyata kurdî, lê belê di edebiyata cîhanê de jî mirov dikare li gelek nimûneyan rast were. Ev hem dikare sirgûna bi riza xwe be, hem jî sirgûna bi darê zorê be. Herçî sirgûna bi riza xwe ye, mirov navê xerîbiyê lê bike çêtir e. Erê, nivîskar li xerîbiyê dijî, dûrî cih û warên xwe, dûrî heval û hogirên xwe, dûrî av û hewa welatê xwe, dûrî xwarin û vexwarina xwe ye. Ev celebê xerîbiyê û heta sirgûn bi xwe jî, pêwîst nake ku mirov ji welatekî, an jî ji qitayekê biçe yeka din. Mirov dikare di hundirê welatê xwe de jî koçber bibe, an jî ji ber sebebên taybetî û şexsî ji cih û warên xwe bi dûr bikeve. Lê xerîbiya ji ber sebebên aborî, hertim imkana vegera cih û war tê de heye. Herçî sirgûna ji ber sebebên siyasî ye, bi gotineke din, sirgûna bi darê zorê ye; ew sirgûn e ku bi êş û elem, bi nexweşî û malkambaxî ye.

Ev celebê sirgûnê ye ku bi sedsalan e pêxîla nivîskaran bernade û berên wan bi welatên dûr vekirine. Sebebên vê sirgûnê dikarin dînî, mezhebî, siyasî, cinsî an jî etnîkî bin. Gava mirov çavekî li dîroka edebiyata sirgûnê digerîne, mirov pêrgî gelek navên şaîr, nivîskar, fîlozof û siyasetvanan tê. Hin ji navên ku tavilê têne bîra mirov ev in: Ovidius, Rafael Alberti, Adorno, Adonis, Josef Brodsky, Nina Berberova, Bertolt Brecht, Samuel Beckett, Xelîl Cibran, Josef Conrad, Dostoyevskî, Çernîşevskî, Dante, T. S. Eliot, Carlos Fauntes, Witold Gomrowicz, Tahar Ben Jelun, James Joyce, Franz Kafka, Lermontov, Thomas Mann, Ezra Paund, Puşkîn, Rilke, Voltaire, Hemingway û gelekên din ku hin deman mecbûr mane, an bi riza xwe dev ji welatên xwe berdane, an jî bi darê zorê ji welatên xwe hatine bidûrxistin.

Di demên şer de, di demên guherandinên sîsteman de, an jî di demên biserketinên îdeolojiyên cida de, bêtoleransiya fikrî dibe sebaba ku karbidest dest bi zilma li ser nivîskaran bikin. Mirov dikare bi hêsanî bibêje ku ev ji dema diaspora cihûyan û heta roja me her wilo bûye. Lê ger em bi kurtî qala vê sedsalê bikin, divê em şoreşa Bolşevîkan, şerê Spanyayê yê hundir, derketina Musolonî, pêşdeçûna Nazîsmê, cûntayên Emerîka Latînî, desthilatdariyên fundamentalîst, şerê Îran û Iraqê, nasyonalîzma ereban û cûntayên Tirkiyê bi bîr bînin.

Zilma li ser kurdan piştî komara Tirkiyeyê zêdetir bûbe jî, dîroka vê zilmê dûr û dirêj e. Ev zilma ha hê ji dema desthilatdariya osmaniyan de derketiye holê û bi komarê re berdewam kiriye.

Di salên gava Mîr Bedir-Xan li keleha Erûxê hêsîr dikeve û dikeve destên osmaniyan, desthilatdariya osmanî wî di warê siyasî de bêtesîr dike û paşê jî wî sirgûnî girava Grîtê dike. Jiyana zarokên wî Emîn Alî û Mîqdat Mîthad jî her bi sirgûnê bihuriye. Jiyana neviyên wî Celadet, Kamran, Sureyya û Safder jî li sirgûnê bihuriye.

Li sirgûnê bingehê rojnamegeriya kurdî hatiye avêtin. Rojnameya Kurdistan di sala 1898an de li Kahîreyê, kovar Jîn di sala 1918an de li Stenbolê, Rojî Kurd di sala 1913an de li Stenbolê, Hawar di sala 1932an de li Şamê, Ronahî di sala 1942an de li Şamê, Roja Nû di sala 1943an de li Bêrûdê û Stêr jî di 1943an de li Bêrûdê hatine weşandin. Kovar û rojnameyên partî û rêkxistinên kurdan yên salên heftêyan li Enqere, Îzmîr û Stenbolê, yên salên heştêyan li Stokholm, Bruksel û Parîsê; dîsa bingehên kovar, rojname û weşanxaneyên salên nodî li Stenbol û Enqereyê hatine danîn.

Di vir de em dibînin, ji bilî edebiyata kurdî ya klasîk ku ji tradisyona medreseyan dihat, çi bigire hemû çapemeniya kurdan û giraniya edebiyata wan ya modern heta salên 2000î li derveyî sînorên Kurdistanê, li biyanistanê bûye û li biyanistanê bi pêş ketiye...

HUNERMEND KEREM GERDENZERÎ:

# Dilê min li Kurdistanê ye



Hunermendê kurd Kerem Gerdenzerî eşkere dike ku herçend ew li Rûsyayê be, dilê wî li Kurdistanê ye û ew bi çîrokên Kurdistanê mezin bûye.

**■ MEHABAD MÊRDÎNÎ**

**KOMA** Wetan di sala 1974ê de li Tîflîsa Gurcistanê ji alîyê çar xemxwirên ziman û muzîka kurdî hatîye danîn. Di salên 1980î de tovên Koma Wetan li muzîka kurdî danîn û li her çar parçeyên Kurdistanê û dîasporayê belav bûn. Wê komê tesîreka mezin danî ser ciwanan û gelek hunermendên kurd liser modêla wan dest bi muzîkê kirin. Yek ji avakarên komê Kerem Gerdenzerî piştî Koma Wetan ji hev belav bû jî xebatên xwe yê muzîkê li gundekê Rûsya didomîne. Kerem Gerdenzerî ji heftenameya Basê behsa avakirina komê,zehmetîyên ku rû bi rû ma ne û li ser muzîkê fikrên xwe parve kir.

**Rocka kurdî bi Koma Wetan hat nas kirin, çi bû sedem ku we komek wiha ava kir?**

Di salên 1970ê de pop-rock hîn nû derketibû. Ciwanan gelekî  ji vê muzîkê hez dikir. Ew hezkirin gîhiştibû ciwanên kurdan jî. Em fikirîn bi kurdî mirov dikare komeka rocka kurdî jî ava bike. Komên ku muzika rock-pop çê dikin li Amerîka û Ewropa mîna The Beatles, Led Zeppelin, Deep Purple di nav ciwanên cîhanê de gelekî bi nav û deng bûn. Bandora komên wiha liser me çêbû. Me hertim stranên wan guhdarî dikir. Me jî xwest ku bi zimanê xwe komeka rocka kurdî ava bikin. Hezkirina min a muzîkê ji zarokatîya min dihêt di biçûkahîya xwe de min perwerdehîya gîtarê stend û di komê de min li bas-gîtarê dida. Ez bi xwe kurdekê  êzdî me li bajarê Tîflîsê yê Gurcistanê hatime dinyayê. Di sala 1972a de em çend ciwanên kurd li hev kombûn û me biryar da ku em komek rock ya bi zimanê kurdî ava bikin. Xebatên me yê komê di sala 1974da de bi dawî bû û me Koma Wetan ava kir.

**Koma Wetan ji çend kesan pêk dihat? Kesên di komê de ji kîjan milletî bûn em dikarin wan jî nas bikin?**

Koma Wetan ji çar kesan pêk dihat yek jê baterîst bû bi xwe êzdî ye navê wî Rafaele Şamilê Dasenî ye. Yê din Levon Grîgorevîç Şaxbazîyan di klavyeyê de bû ew ermenî bû, Omerê Sebrîyê Recevî solo-gîtar û vocal dikir ew jî êzdî bû û ez jî bas-gîtar,vocal û wekî berpirsyarê komê bûm. Niha hevalên din li Ewropa û Gurcistanê dijîn.

**We di sala 1979an de yekem demoya bi navê ‘’Bayê Payîzê’’ amade kir, pêvajoyek çawa bû? Hûn bi zehmetîyên çawan re rû bi û rû man?**

Di sala 1979an de me xwast ku plakeka pêkhatî ji 12 stranan derxin. Lê gelek astengî ji me re derketin li Sovyeta berê. Li Moskowê komîsyona kompozîtoran hebû, divîya vê komîsyonê ev daxwaza me bipejiranda û îmze bikira; jiber pirsgirêkên wisa plaka me ya bi navê ‘’Bayê Payîzê’’ di sala 1989an de derket. Wê demê komîsyonê bang li me kir, me got pereyên ku ji plakê hatîye, bistînin. Di wan salan de komkujîya Helebçe çê bibû. Me got ew pere jibo kesên ku di komkujîyê de xisar dîtine û penaber bûne bila li Londonê bikeve hesabekê peran, ku jibo vê armancê hatibû vekirin. Me daxwaz ji komîsyonê kir ku wan pereyên dahata plakayê ji wî hesabî re bişînin. Wan daxwaza me pejirandin û liser plaka me jî wiha nivîsîn”pereyên ku ji vê plakê bihêt, dê jibo mexdûrên komkujîya Helebçe jibo hesabê Londonê bihête şandin.’’




**We 44 sal berê yekem koma rocka kurdî ava kir. We tesîreka çawan liser muzîka kurdî kir? Dema em li komên niha dinêrin ji nişka ve derdikevin qada muzîkê û di demek kurt jî wenda dibin, sedema vê çi ye?**

Belê 44 salan me koma rocka kurdi ava kir û heta roja îro jî ez bi derfetên xwe jibo pêşketina muzîka kurdî hîn jî dixebitim. Di nav milletê me de gelek muzîsyen û komên baş hene lê jiber derfetên me yê aborî tune ev kom zû belav dibin. Jiber ku welatekê me û dewleteka me tune ku stranbêj bikarin hunera xwe bi awayekê azad lê pêk bînin. Sed heyf e ku komên wekî rocka kurdî dikin jiber aborîyê belav dibin û xebatên xwe yê muzîkê nadomînin.

**Gotinên stranên we ji alîyê kê dihatin nivîsîn, çavkanîyê ku we sûd jê werdigirtin hebû?**

Muzîk û gotinên komê min çê dikirin. Ligel ku me stranên biyanî guhdar dikir lê dilê me û rihê me û awaza me bi hertim kurdî bû. Helbestên wekî yê Ordîxanê Celîl, Karlênê Çaçan, Mîkaîlê Reşîd, Ezîzê Îsko, Letîfê Hiseyn. Min muzîkên van helbestan çêdikir û bi formata stranan me digot.

**Li welatê xerîbîye derfet hebû ku hûn tevlî bernameyên muzîkê bibin?**

Di sala 1977an de li Gurcistanê festîvalek hat li dar xistin, wê demê Koma Wetan jî vexwandin festîvalê. Vê yekê kêfxweşîyek mezin xist nav komê, jibo ku koma me ji alîyê gelek kesan bihêt naskirin ev derfeteka mezin bû. Bi hezaran kes jibo temaşekirinê hatibûn. Em derketin ser dikê û me stranên xwe gotin, koma me ji alîyê gelek kesî ve hat ecibandin. Di heman demê de ev festîval pêşbazîya komên rockê bû û di wê pêşbazîyê de em ketin astekê baş û piştre me xelat jî stand. Ji alîyê din ve ev bername di televîzyonên Gurcistanê û welatên ku bi Yekîtîya Sovyetê ve girêdayî bi awayekê  zindî derket. Piştî bernameyên televîzyona Gurcistanê bi Koma Wetan re bernameyên taybet jî çêkirin.

**Hinek stran xwedî çîrok in, wekî mînak straneka we ya liser Mella Mistefa Barzanî hatîye nivîsandin heye bi navê ‘’Nemir’’ çîroka vê stranê heye? Çi bû sedem ku we straneka wiha nivîsand?**

Strana ku min liser Melle Mistefa Barzani nivîsand û stra di sala 2003an li Fransayê ya bi navê ‘’Nemir’’ ji bo 100 salîya Mistefa Barzani bû.  Wê demê ez li Fransayê penaber bûm, derfeta min tunebu ku xebatên xwe yê muzîkê li studyo birêve bibim. Piştî 3 salan di 2006an de ez vegerîyam Moskowê û min sitrana Nemir li studyo çêkir.

**Koma Wetan çima xebatên xwe yê muzîkê bi dawî anî?**

Di sala 1991an Sovyet belav bû, gelek pirsgirêkên aborî derketin holê jiber van sedeman Koma Wetan jî belav bû. Bi malbata xwe re, hevjîn û pênc zarokên min em derbasî Moskowê bûn. Piştî kom belav bû jî min dev ji muzîkê berneda û min xebatên xwe domandin. Li Moskowê di sala 1995an ez liser albûmeka nû xebitîm, min xebatên xwe yê muzîkê bi muzîsyenên rûs re berdewam kir. Albuma min ya bi navê ‘’Azadî’’ di sala 1997an de derket.

**Dema mirov li stranên Koma Wetan guhdarî dike, di hin stranan de bi awayekê eşkere wekî mînak strana ‘’Sînê’’ de gotinek wiha heye’’birîndar im ez mîna teyrê nav ezmanê Kurdistanê’’ hin cîhan jî bi awayekê  nixumandî hesreta welêt diyar dibe. Dûrbûna welêt li ser muzîka komê bandorek erênî an neyênî çêkirîyê?**

Rast e, ev hezkirina Kurdistanê nîşan dide, hezkirina axa kal û bavê me ye. Hezkirina dîroka miletê me kurdan e. Ev hezkirina jî bi saya dê û bavê min di hundirê min de şîn bû. Jiber dûrbûna welêt jiber hesretîya wê me bi muzîk û awaza xwe, digîhand welatê xwe. Dema ez zarok bûm, dê û bavê min ji min re gelek çîrok û meselok digotin ji alîyê din ve dîroka Kurdistanê jî digotin. Ev hemû tiştên min jimartin xwe di muzîk û stranên komê de jî nîşan dida. Liser azadîyê, tifaqê û mêrxasîya miletê kurdan jî min gelek stran nivîsandin û gotin.

**Niha xebatên we yên muzîkê di çi rewşê de ne, projeyên we hene?**

Ez hîn jî xebatên xwe yê liser muzîkê didomînim, niha liser albûmeka nû dixebitim ev albûm ji 11 an 12 strana pêk dihêt, kurê min yê bi navê Şerîf di solo-gîtar de wekî muzîsyen di albûma nû de cîh digre, muzîsyenê din jî giş rûs in. Niha ez li gundekê  Rûsya dijîm lê dilê min rihê min li Cizîr, Amed, Kobanê û Şengalê ye. Daxwaz û hêvîyên min ji xwedê ev e ku ez Kurdistana serbixwe bibînim.

